Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar :1363 · 29-Adar-2026 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Taxa Xerbî...Yek ji girîngtirîn taxên bajarê Qamişlo

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**



**Taxa Xerbî yek ji taxên sereke yên bajarê Qamişlo ye, taxeke ku ji kevintirîn dem ve hatiye avakirin û ev tax bi taybet bi dîroka xwe ya çandî, siyasî û bûyerên civakî tê naskirin.**

Dîroka Taxa Xerbî ya li bajarê Qamişlo, bi pêşketina bajêr bi xwe re girêdayî ye û wekî yek ji taxên herî kevin û girîng tê naskirin. Taxa Xerbî li kêleka navenda bajêr û li ser riya sereke ya ku Qamişlo bi Amûdê ve girê dide, hatiye avakirin. Ew wekî navendeke nîştecihbûnê ya bi rûmet û aram dihat naskirin. Taxa Xerbî îro bi avahiyên xwe yên nûjen û jiyana xwe ya bazirganî ya zindî, wekî yek ji rûyên sereke yên bajêr tê dîtin.

Di taxa Xerbî de nêzî 35,000 mal hene. Taxa Xerbî ji ber mezinahiya xwe li ser çend komînan wek Komîna Şehîd Leheng, Şehîd Hogir û hwd hatiye dabeşkirin da ku xizmetguzarî bigihêjin hemû malan.

### Navlêkirina taxa Xerbî

Di salên dawî de, bi taybetî piştî Şoreşa Rojava, navê Taxa Xerbî bi fermî wekî Taxa Şehîd Meysa Baqî an jî bi kurtasî Taxa Şehîd Jiyan hate guhertin. Lê belê di nav xelkê de û di nava gel de, hîn jî bi giranî navê wê yê dîrokî û naskirî, bi navê "Taxa Xerbî" Taxa Rojavayê, tê bikaranîn. Ev nav ji ber cihê wê yê erdnîgarî ku dikeve rojavayê navenda bajarê Qamişlo lê hatibû kirin.

### Avakirina taxa Xerbî

Avakirina Taxa Xerbî ya li bajarê Qamişlo, bi pêşketina bajêr a di nîvê yekem ya sedsala 20'an de bi taybet piştî sala 1926'an dest pê kiriye. Ev tax wekî perçeyek ji plana firehkirina bajêr a ber bi Rojava ve hat avakirin. Pêvajoya Avakirinê ya bajarê Qamişlo di salên 1920'î de di bin manda Fransayê de hat plankirin. Taxa Xerbî bi demê re, dema ku nifûsa bajêr zêde bû û xelk ji navendê ber bi derve ve çû, hêdî hêdî li dora navendên olî û bazirganî ava bû. Ev tax wekî perçeyek ji plana firehkirina bajêr a ber bi Rojava ve hat avakirin.

### Di taxa Xerbî de cihê navdar

Di avakirina taxê de roleke dîrokî ya Camiya Qasimo bi Camiya Mezin ya li taxê hat heye. Berê li dora vê camiyê mal kêm bûn, lê bi demê re malên ku li dora wê hatin avakirin tax gihand hev û wekî "Taxa Xerbî" hat naskirin.

### Girîngiya Civakî û Çandî li taxa Xerbî

Taxa Xerbî mînaka herî diyar a jiyana hevbeş e. Kurd, Mesîhî, Suryan, Ermen û malbatên kevnar ên bajêr bi dehan salan e bi hev re di nava aştiyê de dijîn. Ev yek bandoreke mezin li ser nasnameya taxê ya toleransê kiriye. Herwiha gelek nivîskar, hunermend û siyasetmedarên navdar ên Qamişlo ji vê taxê derketine. Hebûna pirtûkxane, navendên hunerî û kofeyên ku rewşenbîr lê dicivin, mîna kofeyên li ser riya Amûdê, taxê dike navendeke çandî ya zindî. Taxa Xerbî bi têkiliyên xwe yên cîrantiyê yên xurt tê naskirin. Malbatên taxê de şîn û şahiyan de her tim piştgiriya hev dikin, ku ev yek reseniya çanda Kurdewarî û herêmî diparêze.

### Bûyerên dîrokî yên taxa Xerbî

Serhildana 2004'an di dema serhildana 12'ê Adarê de, Taxa Xerbî yek ji navendên çalakiyan bû û şêniyên wê roleke mezin di berxwedanê de lîstin. Herwiha Teqîna 27'ê Tîrmeha 2016'an yek ji rûpelên herî bi êş di dîroka taxê de ye. Di vê rojê de teqîneke mezin a DAIŞ'ê li ser riya giştî ya taxê rû da, ku bû sedema şehîdbûna bi dehan sivîlan û wêraniya gelek avahiyan.

### Rewşa niha ya taxê

Îro Taxa Xerbî weke navendeke zindî ya bazirganî û jiyanê tê dîtin. Tevî pirsgirêkên mîna kêmkirina avê di demên dawî de, tax hîn jî nasnameya xwe ya dîrokî û çandî diparêze. Bi kurtasî, Taxa Xerbî niha di qonaxeke nû ya dîrokî de ye ku tê de hewl tê dayîn hem ewlehiya taxê bê parastin û hem jî di bin sîwana peymanên nû de jiyana asayî berdewam bike.

## Bi kamîreya Hemza Sêvo



## Gotina Dawî



Mihemed Seydi

### HTŞ'ê berê xwe da kuştina Xiriştiyanan!

Bi hilweşîna rêjîma Baas û reva serokê wê Beşaar El-Esed re, Sûriya radestî HTŞ beşa El-qaide ya Sûriyê bi serokatiya Ebû Mohammad El-Colanî hat kirin. Bi guhertina kincên van terorîstan xwestin bi miletê Sûriyê bidin qebûl kirin ku vaye Ebû Mohammed El-Colanî Demokrat bûye û Taxim û Gerafêt li xwe kiriye û nema doza dewleta Îslamî dike û dest ji radîkalbûna El-Qaide berdaye. Bi van gotinên ku dihatin kirin re, li Berava Sûriyê êriş li dijî xelkê Elewî pêk hat û bi hezaran ciwanên vê herêmê bi destê van gurûpên radîkal hatin kuştin. Ev êriş di bin navê ku Elewî berê alîgirên rêjîmê bûne û bi vî awayî xwestin komkujiyên li dijî Elewiyan rewa bidin nîşandan. Lê gotineke pêşiyan heye dibêje ku Gîha di bin Kevir de namîne û hemû komkujî û destdirêjiyên li dijî Elewiyan bi Vîdeo û wêneyan hatin belavkirin û herkesî dît çi keraset hat kirin. Di sêrî de Dewleta Tirk û nûnerê taybet yê Trupm Tommas Barack pesnê Colanî ku navê wî niha bi Ehmed El-Şeri tînin ziman dan û xwestin rojeva bûyerên li Beravê bugherin û guhertin. Hîne ev komkujî nehatibûn ji bîr kirin, vê carê di bin navê Bedewiyan û Eşîran de berê xwe dan Durziyan li Siwêdayê û jin û zarokên wan revandin û mêr jî li nava kolanan hatin kuştin. Bê serûber mirov li nava kolanan û malan hatin gulebarankirin û paşê hin Video belav bûn ku mirov mejbûr kirin xwe ji qatên sisê û çaran bavêjin xwarê û wiha kerasetê dewam kir. Lê bi mudaxeleya Îsraîlê û bombebarankirina Şamê re, hinekî pêla van êrişan kêm bû û ev gurûpên ser bi Ebû Mohemmed El-Colanî ve şûnde vekşiyan. Van gurûpan Gelabî û Kiras li xwe kiribûn û qaşo eşîrin, Fîncanên Qehwê li xwe heram kirin û gotin heta ku qira Durziyan neyînin, ew ê Qehwê venexun.

Herwiha di dema êrişên li ser Siwêdayê de, gefa ku piştî Durziyan dora Kurdan jî tê ye xwarin û heta ku êrişên li ser taxên Kurdan ên li Helebê dest pê kirin. Li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê cenazeyê şervana jin a Kurd Denîz ji qatê Sisiyan hat avêtin û bi sedan Kurd hatin êsîrgirtin û gelek jî ji ber ku Kurd bûn, ne şervan bûn jî hatin kuştin.

Van rêze komkujiyan dewam kir û heta li Reqa û Kobanê jî ajot. Li her devera ev kom dighîştinê, ger mirovên Kurd nedîtana jî mal û milkê wan talan dikirin û yên nekirin jî agir pê dixistin û wêran dikirin. Ev sucana jî hemû ji aliyê Çavdêriya mafê mirovan a Sûriyê ve hatin belgekirin.

Piştî van komkujiyan hemû, di sêrî de Amerîka û serokê wê Dland Trump, pesna serokê Cîhadîstan dide û wekî ku mirovê herî baş e bi lêv dikin.

Erê, yê herî başe ji bo meşandina berjiwendiyên hin aliyan, lê yê herî zêde mirov jî bi destê wan li Sûriyê hatin kuştin, HTŞ û serokê wê Colanî ye. Li vir neqediyan ev komkukjî, vê carê berê xwe dan Xiriştiyanên li Hema yê û di 27'ê Adarê de li Taxa Şêx Dahir an bi navê din Siqiliya biçûk êrişî cihên Xiriştiyanan hat kirin û dukan û malên wan hatin talakirin. Ev êriş jî di bin navê Xiriştiyan kafirin de tê kirin û gelek dîmen jî belav bûn ka çawa bi komî êriş li ser xelkê tê kirin. Ev komkujî jî di demekê de tên kirin ku serokê HTŞ'ê Ehmed EL-Şeri li Berlînê tê pêşwazî kirin. Ger mirov li hember van komkujiyan xwe nedin hev, ew ê DAIŞ li Sûriyê hemû bibe serwer.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Tu jî zanî ku roj xirab li min çûye ava:**
- Tu jî zanî ku rewşa min pir xirab e.

**War kor bibin, nexinisin:**
- Mirov kor bibe dîsa ji derketina ji rê baştir e.
(Nexinisin: Nexurifin; ji rê dernekevin)

**Xwedê jê standiye:**
- Rewşa wî xirab e; karê wî li hev nayê.

**LI SER SEBRÊ**

**Behr e:**
- Bêhna wî pir fireh e.

**Daqurtand:**
- Li ber xwe da; sebir kir; tehemul kir; dengê xwe nekir.

**Dûvê dinyayê dirêj e/kuriya dinyayê dirêj e/kilkê dinyayê dirêj e:**
- Lezê neke; bêhna xwe fireh bike.

**Kevirekî dayne ser dilê xwe:**
- Sebir bike; li ber xwe bide.

**Kevir daye ber dilê xwe:**
- Li ber xwe dide; sebir dike; dikişîne nava xwe; xwe radigire.

**Li ser xwe ye:**
- Bêhna wî fireh e; zû hêrs nabe.

**Pêlên borîn jixwe borîn, yên bên hê pirtir in:**
- Sebir bike; li ber xwe bide; yê çêkirinê be; xirab neke; li hev werin.

**Pêlên mayîn ji yên borî pirtir in:**
- Bi heman wateyê.

**Rojên dinyayê dirêj in:**
- Bêhna xwe fireh bike; bisebir be; lezê neke.

**Rojên dinyayê xilas nebûne:**
- Bi heman wateyê.

**Singa me vekirî ye:**
- Em amde ne her kesî pêşwazî bikin; em dikarin bi her kesî re bidin bistînin; em zûbizû teng nabin.

**Singa wî fireh e:**
- Bêhna wî fireh e; zana ye; bitecrûbe ye.

**Wê erzan bibe:**
- Lezê neke; sebir bike; nekeve kelecanê.
(Dema yek dixwaze pir bilez fêrî tiştekî bibe hingê jê re tê gotin)

**Xemên xwe pê direvîne:**
- Sebra xwe pê tîne; xemên xwe bi wê ji bîr dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Zindana Qerçax û Evînê bûne qesabxane û hikumet biryara 211'an pêknayîne



Rêjîma Îranê di serhildana gel de bi hezaran jin girtin û bi sedan jî kuştin. Bi taybet girtiyên di girtîgehên Qerçax û Evînê de rewşa wan zehmetir dibe û di nava şerê heyî de hikumet biryara 211'an a serbestberdana girtiyan û garantiya ewlebûna jiyana wan pêknayîne.**R-2**

## 79 sal ji darvekirina Qazî Mihemed... Rojhilat hemdemî pêvajoyeke nû ye




Qazî Mihemed di rûpelên dîroka Kurdistanê de xwedî cihekî girîng û sereke ye. Komara Mihabadê ku ji aliyê Qazî Mihemed ve hatibû avakirin, mîras û ronahiya di rêwîtiya têkoşîna gelê Kurd de ye...**R-6**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1363 · 29-Adar-2026 · www.ronahi.net/ku/ · Nirx: 500 L.S

# PÊVAJOYA AŞTIYÊ JI BÊDENGKIRINA ÇEKAN BER BI GUHERTINA ZAGONAN VE

Nivîskarê Kurd Ebûd Mexso diyar kir ku qonaxa yekemîn a pêvajoyê ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hatiye bicihanîn, lê niha berpirsiyarî dikeve ser dewleta Tirk û hêzên siyasî yên ku soz dane guhertinên qanûnî, pratîkî bikin. Her gavek çiqas biçûk be jî, dikare bingehek xurt ji bo aştiyê ava bike, serkeftina pêvajoyê ji bo Kurdistanê bi giştî û tevahî herêmê girîng û bi bandor e."**R-5**







## Aloziya li Reqayê û êrişên li dijî Kurdan



Reqa ya ku beriya heyva Çileya 2026'an cihê ewlehî û mînaka bajariya pirrengî û nasnameyan bû, piştî hatina hikumeta demkî ya Sûriyê, ev muzeyîk veguherî bajarekî wêrankirî, bê ewle ku kes nizane wê li ku û kengî bê kuştin an revandin. Berbelavbûna bê ser û ber û kîna li hember gelê Kurd, jiyana gel wêran kiriye.**R-7**

## Barîna baranê zeviyên kantona Cizîrê geş kir



Piştî çend salan ji hişkesaliyê, li Kantona Cizîrê îsal baraneke baş bariya û pê re zevî geş bûn, herwiha tevahî çem û rûbarên ku zuha bûbûn jî, ji nû ve herikîn.**R-8**

## Li Rojhilata Navîn şer û aştî



Rojhilata Navîn ji destpêka sedsala 20'an ve bûye qada şer û nakokiyên herî giran ên cîhanê. Di çarçoveya şer û aştî de pêvajoya aştiyê ya 27'ê Sibatê ku ji aliyê Rêber Apo ve hat destpêkirin, ew nimûneyek girîng a hewldanên çareseriyên siyasî li tevahî herêmê ye, her çendî şertên herêmê pir aloz in, lê ev nîşan dide ku di nav şertên şer de jî, dibe ku deriyên aştiyê bên vekirin.**R-4**



**Tabloya Li Herêmê Ne Sade Şer e, Ne Jî Aştiyeke Zelal e!**
Idrîs Henan R-4



**'Ez jî dixwazim Serok Apo bibînim!'**
E.Pêjder Altan R-6



**Newroz û Xwenûkirin**
Hafiz Ahmet Turhalli R-7

# Zindana Qerçax û Evînê bûne qesabxane û hikumet biryara 211’an pêknayîne

**Rêjîma Îranê di serhildana gel de bi hezaran jin girtin û bi sedan jî kuştin. Bi taybet girtiyên di girtîgehên Qerçax û Evînê de rewşa wan zehmetir dibe û di nava şerê heyî de hikumet biryara 211'an a serbestberdana girtiyan û garantiya ewlebûna jiyana wan pêknayîne.**

**Esma Mistefa**



Jinên wêrek ên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, bi taybetî yên di yekîneyên berxwedanê de, di vê serhildana neteweyî de hebûneke berbiçav, bihêz û eşkere diyar kirin. Ji xwepêşandanên kolanan bigire heya meydanên serhildanê, ji merasîmên cenazeyên şehîdan bigire heya xwepêşandanên şevê, ew di her alî de amade bûn û rêberiya vê serhildanê kirin. Dayik, jinên temen mezin û keçên ciwan pirek di navbera nifşan de çêkirin. Jinên Faris, Belûç, Kurd û Azerî di nav komên xwe yên etnîkî de roleke girîng lîstin. Rêjîma Îranê piştî Serhildana Jin, Jiyan, Azadî sala 2022’an de, çavên xwe ji hêz û berxwedana jinên serhidêr şikestiye û têgihêşt ku jin bi yekbûn û hebûna xwe dikarin sîstemeke dewletê ya temenê wê bi sed sala ye hilweşînin. Li hember wê serhildanê hikumeta Melayî ya Îranî bi hemû hêz û faşîstbûna xwe li hember wê serhildanê sekinî û kiryarên dijmirovî yên ku tê de bi hezaran jin hatin qetilkirin, girtin, darvekirin, tunekirin û îşkencekirin, pêk anîn. Ew serhildan rûxmî hemû hewildanên têkbirinê lê muhra xwe li dîroka rêjîma Îranê xist.

Rêjîma Îranê di serhildana gel ya Çileya 2025’an de hatiye destpêkirin de, sîstema melayan careke din di van serhildanan de dest avêtin hêza jinan. Jinên ku îlhama xwe ji serhildana Jin, Jiyan, Azadî girtine careke din bi heman helwestê daketin meydanên berxwedan û têkoşînê. Rêjîma Îranê bi hezaran jin girtin û bi sedan jî qetilkirin. Rûxmî nefesa vê rêjîmê ya dawiyê lê hîna jî dest ji pêkanînên xwe yên dermirovê bernade. Rewşa girtiyên jin di girtîgehên Îranê de her ku diçe xiarbtir dibe û tu alî ji dengê wan girtiyan re nabe guhdarvan. Di vê rapora xwe de em dixwazin kêm be jî bale bikşînin ser rewşa wan girtîgehan û di wir de çi tê jiyankirin.

### Girtîgeha Qerçax

Zindana Qerçaxê, sembola binpêkirina eşkere ya mafên jinên girtî li Îranê, ji bo jinan bûye qesabxane. Qerebalix e, pêdiviyên bingehîn nayên peydakirin, di nav de tunebûna ava vexwarinê, û nebûna xizmetên bijîşkî. Li gorî çavkaniyên ji hundirê girtîgehê, ji destpêka vê salê de herî kêm 23 jin li girtîgeha Qerçaxê mirine, bêyî ku navên wan an sedema mirina wan di tu raporekê de were behs kirin.

Gelek ji van mirinan ji ber nexweşiyên ku dihatin dermankirin û nehatina dermankirin çêbûne. Di nav girtiyên jin de, gelek jin ji nexweşiyên giran dikişînin, weke penceşêra hêkdankê ya du alî û endometriozît. Her wiha bijîşkan tekezî li ser pêwîstiya lezgîn a veguhestina wan bo navendên dermankirinê yên taybet kirine. Lêbelê, dadwerê girtîgehê dayîna destûrên dermankirinê qedexe dike û garantiyên darayî yên bi qasî deh qat mîqdara asayî destnîşan dike ku girtiyên jin û malbatên wan nikarin bidin, ferz dikin. Tenê di 10 rojan de, ji 16 heta 25’ê Îlona 2025’an, herî kêm sê girtiyên jin li girtîgeha Qerçaxê mirin ew jî: Sumeya Raşidî, Cemîle Azîzî, û Sudaba Asadî, ji ber redkirina lênihêrîna bijîşkî û derengketina veguhestina wan bo nexweşxaneyê. Astengkirina dermankirina tenduristî di hemû girtîgehên rêjîma melayan de pratîkek gelemperî ye û dibe sedema mirina girtiyên jin. Zindana Ferdîs li Kerecê yek ji van mînakan e ku di wir de jî bi sedan jin ji ber nebûna lênîrîna tenduristî û qedexekirina dermankirinê de jiyana xwe ji dest dane.

### Qedexekirina dermnankirinê pratîkeke sîstematîk e

qedexekirina dermankirina bijîşkî di zindanên Îranê de weke me aniya ziman pratîkek gelemperî û sîstematîk e. Qedexekirina dermankirina bijîşkî ji girtiyên siyasî yên jin û girtiyên ji ber helwesta xwe dane nîşandan re pratîkek sîstematîk e di nav sîstema zindanên rêjîmê de. Di salên dawî de, karanîna vê taktîkê bi giranî zêde bûye, gelek girtî ji ber redkirin an derengketina lênêrîna bijîşkî jiyana xwe ji dest dane. Yek ji mînakên herî berbiçav ên mirinên sala borî di nav girtiyên jin de ji ber bêparî û derengketina dermankirinê mirina girtiya siyasî Sumeya Raşîdî bû. Di dema girtina wê de ew bi tundî hate lêdankirin, hêzên ewlehiyê serê wê li dîwêr dan û li ser singa wê rûniştin, lê rêjîmê ji bo dermankirina birînên wê yên ji ber girtinê ti tedbîr negirt. Sumeya bi salan ji nexweşiya Mîgrenê angu serêşê dikişand, û li gorî îfadeya hevkarê wê, ew ji ber krîz û serêşên giran gelek caran serdana klînîkê dikir, lê bijîşkên girtîgehê rewşa wê wekî “nexweşiya sexte” dihesibandin. Bi vê awayî di 16’ê Îlona 2025’an de, ji ber kirîza di serê wê de, piştî deh rojan di girtîgeha Qerçaxê de jiyana xwe ji dest da. Ev û gelek mînakên din hene ku jin di girtîgehên Îranê de bi van polîtîkayan re rûbirû dimînin. Li hember wê yekê tu rêxistinên hindir û derve de xwe berpirsyar nabînin û lîpirsînên derbarê van rewşan de nakin ger hebe jî nebûye hêza çareseriyê.

### Di serhildana gel de zêdetirî 80’î jin di girtîgeha Qerçaxê de ne

Nêzîkî 80 jinên ku di serhildana Çile de hatine girtin, li girtîgeha Qerçakê têne girtin ku jixwe pir qerebalix bû û kêmasiya îmkanên bingehîn hebû. Ev 80’î jinên girtî di holeke pênc odeyan de hatibûn bicihkirin; cihekî ku ne li gorî hejmara niha ya girtiyên jin e ku ev yek bûye sedema zêdebûna nifûsa vê beşê girtîgehê.

### Şert û mercên girtinê yên dijwar û diyardeya razana li erdê

Şert û mercên ragirtina girtiyên jin li girtîgeha Qerçakê wekî pir dijwar hatine wesifandin; ji ber nebûna nivîn û cîhên têrker, bi dehan girtî neçar in ku “li erdê razên”. Razana li erdê di zindanên rejîmê de pirsgirêkek ku her kes dizane tê zanîn; rewşek ku girtî ji ber qerebalixiyê neçar dimînin ku rasterast li erdê razên. Ev pirsgirêk ji bo girtiyên jin ên li Girtîgeha Qerçaxê bûye pirsgirêkek cidî. Di heman demê de di aliyê paqijiya xwe de, gelek kêmasî hene ku alavên paqijkirina beden ji bo jinana gelek kêm in. Nebûna îmkan û alavên paqijiyê û tenduristiyê di girtîgehan de metirsiya belavbpûna nexweşiyan zêde dike û jiyana girtiyan dixe metirsiyê.

### Qedexekirina serdanên malbatan

Pirsgirêkek din a ku girtiyên jin pê re rû bi rû dimînin, betalkirina serdanên malbatê ye. Serdanên şexsî li Girtîgeha Qerçakê hatine betalkirin, û ev yek gelek ji van jinan ji derfeta dîtina malbatên xwe bêpar dihêle.

Di bin van qedexeyan de, gelek malbat di derbarê rewşa zqarok, nas û xizmên xwe yên di girtîgehê de agahdariya rast nagirin, ev yek jî dibe sedema fikarên berfireh. Wekî din, hin ji van jinan demek dirêj e ku nikarin malbatên xwe bibînin, û têkiliya wan bi cîhana derve re bi tundî hatiye sînordarkirin.

### Girtîgeha Evîn

Raportên ji girtîgeha Evînê nîşan didin ku, ji ber şert û mercên şer û îhtîmala bûyerên nepêşbînîkirî, jiyana girtiyan, bi taybetî girtiyên siyasî û 200 girtiyên jin ên ku di vê girtîgehê de ne, di xetereyeke cidî de ye. Nebûna berpirsiyariyê ji aliyê rayedarên rejîmê ve, kêmkirina xizmetguzariyan, û paşguhkirina pêwîstiya berdan an veguhestina girtiyan, tirsa ji krîzeke mirovî bi giranî zêde kiriye. Berdewamiya ragirtina girtiyên siyasî, bi taybet jinan, di şert û mercên wiha de, fikarên gefa li ser ewlehiya wan zêde kiriye.

### Deriyên di girtîgehê de têne lihêmkirin, asê kirin

Di nava rewşa şer û kirîza ku Îran tê re derbas dibe de, raport nîşan didin ku deriyên hin girtîgehan ji bo pêşîgirtina li her hewldanek revînê di rewşên awarte de hatine girtin, astê kirin. Ev nêzîkatî di rewşa rûdana qezayek an êrîşekê de fikarên cidî li ser ewlehiya girtiyan derxistiye holê, ji ber ku îhtîmala valakirinek bilez an veguhastina girtiyan bo cihekî ewle dê pir sînordar be.

### Kirîza jiyan û tenduristiyê li girtîgeha Evînê

Di nav pirsgirêkên herî girîng ên di girtîgehê de, weke di girtîgeha Qerçaxê de me aniye ziman ev yek di girtîgeha Evîn de jî tê jiyankirin. Nebûna ava germ û kêmbûna mezin a xizmetên tenduristî, bijîşkî û dermanan e heye. Ev di demekê de tê ku gelek girtî ji ber qerebalixî û şert û mercên girtinê ji nexweşiyên laşî dikişînin û pêdiviya wan bi lênêrîna bijîşkî ya bilez hene.

### Biryara 211 û berpirsiyariya yasayî ya dadweriyê

Li gorî biryara hejmar 211 ku ji aliyê Lijneya Dadwerî ya Bilind ve di 12’ê Çileya 1987’an de hatiye derxistin, dadwerî di rewşên awarte yên ji ber şer de mecbûr e ku tedbîrên tavilê bigire da ku jiyana girtiyan biparêze. Ev biryar veguhestina berdana demkî, dayîna berdana şertî, qebûlkirina kefalet an garantiyan, û her weha veguhestina girtiyan bo cihên ewle vedihewîne.

Li gorî vê biryarê, eger tedbîrên asayî têrê nekin, dozgerên giştî xwediyê biryarê ne ku girtiyên ku xetereya ewlehiyê çênakin heta ku rewşa awarte bi dawî bibe berdin. Di nav wan de; girtiyên siyasî, girtiyên ku ji ber nêrîna xwe hatine girtin, her wiha yên ku ji ber sûcên neqesdî û darayî hatine mehkûmkirin, û yên ku ji ber sûcên piçûk hatine mehkûmkirin di nav kategoriyên ku dikarin di bin van tedbîran de werin girtin de ne. Di derbarê kesên ku bi sûcên tundûtûjî hatine mehkûmkirin de, biryar destnîşan dike ku ew ji bo navendên ewle werin veguheztin. Pisporên hiqûqî tekez dikin ku di şert û mercên heyî de bicîhanîna vê biryarê erkê qanûnî yê bileze ku nayê paşxistin. Bi gefên leşkerî yên berdewam re, her derengketinek di dayîna biryarê de dikare bibe sedema encamên mirovî yên bêveger, ji ber ku girtî nikarin xwe li hember êrîşên hewayî an mûşekî biparêzin, û berpirsiyariya parastina jiyana wan rasterast dikeve ser milê dadwerî û pergala girtîgehan.

### Ji pêkanîna biryarê tenê 20 girtî hatin berdan

Li gorî agahiyên bedrest ku qaşo hikumetê biryara 211 pêk aniye, tenê hejmareke sînordarkirî ji girtîgeha Evînê hatine berdan, di nav wan de hin girtiyên siyasî hene ku kêmtirî çar mehan cezayê wan maye û hejmarek girtiyên di dozên darayî de ku deynên wan kêmtir ji 750 milyon tûmenî bûn. Raport nîşan didin ku hejmara kesên hatine berdan ji 20 kesan kêmtir bû ku ev hejmareke pir kêm e li gorî rewşa krîtîk a heyî. Li gor vê yekê bangên ji bo bicîhanîna bilez a Biryarnameya 211 ji bo hemî girtiyan zêde bûne ku pêkanîna wê gaveke ku dikare bibe alîkar ku xeteriya li ser jiyana girtiyan kêm bike û krîza mirovî li Girtîgeha Evînê kontrol bike.

Hêjayî bîrxistinê ye ku Rêxistina Mafê Mirovan (HRANA) derbarê binpêkirinên salekê yên dijî jinan yên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê, raporek belav kir.

Li gorî raporê, ji 21’ê Adara sala 2025’an heya 21’ê Adara 2026’an, li Rojhilatê Kurdistan û Îranê 61 jin hatin darvekirin û cezayê darvekirinê bi ser 13 jinên din jî hatiye sepandin.



# Komkujiya El-Daein li Sûdanê

**Artêşa Sûdanê di 20'ê Adarê de li ser Nexweşxaneya Hînkirinê ya El-Dæin li Eyaleta Darfûra Rojhilat êrişeke pêkanîbû û di encamê de herî kêm 64 kes hatin kuştin, herwiha nêzîkî 90 kesên din jî birîndar bûn. Derbarê vê yekê de Mexbera Lêkolînên Mirovî li Fakulteya Tenduristiya Giştî ya Yalê raporek derxist û tawanbar eşkere kir.**

**Navenda Nûçeyan**

Êrişa li ser Nexweşxaneya Hînkirinê ya El-Daein li Eyaleta Darfûra Rojhilat di êvara Înê 20’ê Adara 2026’an de pêleke şermezarkirinê ji aliyên herêmî û navdewletî derxist holê. Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê piştrast kir ku herî kêm 64 kes, di nav de 13 zarok û karmendên bijîşkî, di yek ji êrişên herî kujer ên li ser sektora tenduristiyê de ji destpêka şerê li Sûdanê ve hatine kuştin.

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê di derbarê êrişê de zelal kir ku bi çekên giran hatiye kirin, di encamê de beşên mezin ên tesîsa bijîşkî ya yekane li bajêr wêran kir û bi dehan kes mirin û birîndar bûn. Di heman demê e bi sed hezaran kes û koçber ji xizmetên bijîşkî yên bingehîn bêpar man.

### Tawanbarkirinên hevbeş di navbera artêşê û Hêzên Piştgiriya Bilez de

Aliyên şer ên li Sûdanê derbarê bombebarankirina Nexweşxaneya El-Daein de hevdu tawanbar dikin. Hêzên Piştgiriya Bilez, ku wîlayeta Darfûra Rojhilat kontrol dikin, artêşa Sûdanê bi êrişeke asmanî ya bi zanebûn li dijî nexweşxaneyê tawanbar kirin û di daxuyaniyekê de bûyer wekî “sûcekî şer” bi nav kir ku armanc jê tirsandina sivîlan e û daxwaza lêpirsîneke navneteweyî ya serbixwe kir.

Di bersivê de, Fermandariya Giştî ya Hêzên Çekdar ên Sûdanê daxuyaniyek weşand ku ev tewanbarkirin şermezar kir. Artêşê pabendbûna xwe bi qanûna mirovî ya navneteweyî piştrast kir û tekez kir ku hedefgirtina tesîsên sivîl ne beşek ji pernesîbên wê ya leşkerî ye. Artêşê, Hêzên Piştgiriya Bilez bi karanîna “nêzîkatiyek sîstematîk” di bombebarankirina tesîsên tenduristiyê de tawanbar kir. Herwiha Artêşê, Hêzên Piştgiriya Bilez bi karanîna sivîlan wekî mertalên mirovî û şaşkirina raya giştî ya navneteweyî tawanbar kir.

### Raporeke mirovî rastiyê derdixe hole

Raporek ji aliyê Mexbera Lêkolînên Mirovî li Fakulteya Tenduristiya Giştî ya Yalê ve hatiye weşandin piştrast kir ku bombebaran û wêrankirina Nexweşxaneya Hînkirinê ya Al-Daein li Eyaleta Darfûra Rojhilat ji aliyê artêşa Sûdanê ve hatiye kirin. Raporê encamên xwe spart li ser analîza wêneyên satelîtê û daneyên dûrbînê.

Herwiha raporê rêbazeke entegrekirina daneyan bi kar anî, materyalên çavkaniya vekirî yên wekî dezgehên medyayê, medyaya civakî û naveroka vîdyoyê analîz kir. Di encamê de agahî li gorî çend çavkaniyan û diyarkirina cihên bûyerê yên demikî û erdnîgarî hat lêpirsînkirin.

Li gorî raporê, êriş roja Înê 20’ê Adarê, roja yekem a Cejna Remezanê di hundirê bajarê Al-Daein, ku di bin kontrola Hêzên Piştgiriya Lezgîn de ye, pêk hat.

### Analîza delîlan: Nexweşxane bi zanebûn hatiye hedefgirtin

Raporê zelal kir ku wêneyên satelîtê ku di navbera 20 û 24’ê Adarê de hatine kişandin, zirara zelal a li avahiya nexweşxaneyê nîşan didin, di nav de zirara gihaştiye banê nexweşxaneyê herî kêm li du cihan, wekî din zirar gihaşt li yek ji dîwarên derve û bermahiyên giran li ser banê avahiyê û rêya derdorê belav bûne.

Hat destnîşan kirin ku cewherê zirarê li gorî bandora cebilxaneyên asmanî ye, ji ber ku herî kêm 3 xalên lêdanê yên rast hatine dîtin, ev yek nîşan dide ku gelek êrişên hedefgirtî hatine kirin. Herwiha wêneyan zirara li deverên derdorê, di nav de avahiyên hikûmet û polîsan nîşan nedane, ku ev yek wekî nîşanek tê dîtin ku nexweşxane hedefa rasterast a êrişê bû, di destpêkê de teqînekê nexweşxaneyê hedef girt û piştî ku bersivkar gihaştin cihê bûyerê, teqîneke duyemîn çêbû, ku wekî tektîka “du caran lêdanê” tê nasîn, armanca wê ku hejmara qurbaniyan zêde bike.

Artêşa Sûdanê daxuyaniyek da û îdia kir ku wan nexweşxane bombebaran nekiriye, ev yek jî bi delîl û analîzên di raporê de hatine pêşkêşkirin re nakok e.

Raporê destnîşan kir ku artêşa Sûdanê di mehên dawî de, bi taybetî di meha Remezanê de, karanîna dronan ji bo hedefgirtina deverên sivîlan û binesaziya girîng di nav deverên ku di bin kontrola Hêzên




Piştgiriya Bilez de ne, di nav de bazar jî, zêde kiribû.

### Girîngiya nexweşxaneyê

Di raporê de hat diyarkirin ku Nexweşxaneya El-Daein tesîseke tenduristiyê ya sereke li Eyaleta Darfûra Rojhilat ye, ku xizmetê dide nêzîkî 3,5 milyon kesan, di nav de nêzîkî 900 hezar kesên ku ji hundir koçber bûne û xizmetên bijîşkî pêşkêşî komên herî bê hêz dike, di nav de yên ku nikarin lêçûnên dermankirinê bidin.

Her wiha di amadekirina karmendên bijîşkî de roleke perwerdeyê dilîze û xizmetên girîng ên wekî şûştina gurçikan dihewîne, ku di Adara 2025’an de piştî ku navendeke berê di êrişeke asmanî ya 2024’an de hate wêrankirin, hate veguhestin bo wê. Vê carê, ew hate hedefgirtin û bi tevahî ji xizmetê hate derxistin. Agahî nîşan didin ku di nav miriyan de 13 zarok, bijîşkek, du karmendên bijîşkî yên jin û heft jin, ku sê ji wan jinên ducanî bûn herwiha 44 mêr, heşt ji wan kalemêr bûn, hene. Di heman demê de heşt karmendên tenduristiyê, 11 zarok, 15 jin û 55 mêr jî birîndar bûn.

### Sûceke şer

Raporê tekez kir ku qanûna mirovî ya navneteweyî statuyek parastî ya taybet dide nexweşxaneyan û hedefgirtina wan sûcê şer e, erge di operasyonên leşkerî yên êrişkar de neyên bikar anîn û pêdivî bi hişyariyek pêşwext heye ku rê dide valakirinek ewle berî her êrişê. Hat zêdekirin ku daneyên berdest nîşan nadin ku ev şert di doza Nexweşxaneya El-Daein de hatine bicîhanîn û hebûna niyetê di hedefgirtinê de wê dike sûceke şer.

Raporê di dawî de encam da ku delîlên berdest nîşan didin ku Nexweşxaneya Hînkirinê ya El-Daein rastî gelek êrişên asmanî yên bi hûrgilî hatiye, di encamê de wêranîyeke berfireh û windahiyên mirovî yên mezin çêbûne, ev yek jî fikarên li ser binpêkirinên qanûna mirovî ya navneteweyî xurt dike.

# Herî zêde zarok dibin qurbaniyên şerê li Rojhilata Navîn

**Lîloz Hisên**

**Li gorî UNICEF’ê di şer û pevçûnên li Rojhilata Navîn de, di 23 rojan de zêdetirî 2 hezar û 100 zarok hatine kuştin an jî birîndarkirin, ji wan 206 zarok li Îranê, 118 li Lubnanê, 4 li Israîl û yek li Kiwêtê ne.**

Bandorên şerê li Rojhilata Navîn, ku ketiye hefteya xwe ya çaremîn, di krîza mirovî de ku sivîl bedela wê didin, digel krîza enerjiyê ya ku ji ber êrişên li ser keştîvaniyê li Tengava Hirmuzê ya girîng û binesaziyên din ên petrol û gazê yên li herêma Kendavê derdikeve holê, berdewam dike.

Li gorî Cîgirê Rêveberê Cîbicîkar ê UNICEF’ê Ted Chaiban, di 23 rojên şerê û pevçûna li Rojhilata Navîn de zêdetirî du hezar û 100 zarok hatine kuştin an jî birîndar bûne, di nav wan de 206 zarok li Îranê, 118 li Lubnanê, çar li Îsraîlê û yek li Kiwêtê. Ted Chaiban hişyarî da ku bi berdewamiya tundûtûjiyê re, ev hejmar dibe ku



zêde bibin.

Di heman çarçoveyê de, Cîgirê Rêveberê Cîbicîkar ê Rêxistina Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) Ted Chaiban wiha got: “Ev tê vê wateyê ku ji destpêka şer ve her roj nêzîkî 87 zarok têne kuştin an birîndar kirin.”

Ted Chaiban tekez kir ku zarokên li herêmê bedelên giran didin û her ketina nav şerekî berfirehtir û demdirêjtir dê ji bo bi milyonan kesên din karîsetbar be.

Di civîneke çapemeniyê de li baregeha NY, Ted Cheiban bang li civaka navneteweyî kir ku divê sê gavên tavilê bê avêtin ew jî ev in: Agirbest, parastina sivîlan, binesaziya sivîl herwiha misogerkirina gihaştina mirovî ya ewle bi awaeykî bilez û bê asteng di heman demê de dabînkirina piştgiriya darayî ya bilez ji bo domandina bersivê.

Ji aliyê xwe ve, Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) hişyarî da ku eger tundûtûjî berdewam bike, dê Rojhilata Navîn bi krîzeke perwerdeyê ya kûrtir re rû bi rû bimîne, di nav de bêparbûna zêdetir ji perwerdeyê ji bo zarokên herî hewcdar, windakirina mamoste û lêkolîneran, lawazbûna baweriya gel bi saziyan be herwiha zirara mayînde li ser şiyanên zanistî yên herêmê were diyar kirin.

### Berdewamiya şer dabînkirina cîhanî bi giranî têk dibe

Nemaze ji ber şerê ku diqewime zincîrên dabînkirina cîhanî bi giranî têk dibe, bihayên kelûpelan bilind dike û bêîstîqrariya li çaraliyê cîhanê zêde dike. Di vê çarçoveyê de, Rêveberê Ofîsa Xizmetên Projeyan a Neteweyên Yekbûyî (UNOPS) Jorge da Silva, tekez kir ku bandorên wê ji herêmê wêdetir in, bi buhayên bilind ên petrol, sotemenî û gazê aboriya cîhanî bêîstîqrar dike. Herwiha operasyonên mirovî jî di bin zextek zêde de ne, ji ber ku qada hewayî, rêyên keştîvaniyê û derbasgehên sereke têne girtin û gihaştina pêdiviyên bingehîn, di nav de derman jî asteng dibe.

Da Silva destnîşan kir ku êrişên li ser keştîyên bazirganî li Tengava Hirmuzê, ku damarek girîng ji bo bazirganiya enerjiya cîhanî ye, gefê li zêdebûna buhayê û derengketinên din dixwe. Tê payîn ku welatên pêşkeftî, nemaze li Afrîqayê û Asyay dê herî zêde zirarê bibînin, ji ber ku astengiyên li bazarên enerjî û xirabûna ewlehiya xwarinê tehdît dikin. Da Silva tekez kir ku çareseriyek leşkerî tune û banga ji nû ve hewldanên dîplomatîk ji bo bidawîkirina krîzê kir.

Li gorî texmînên UNICEF’ê, nêzî 3,2 milyon kes li Îranê koçber bûne di heman demê de zêdetirî milyonek kes li Lubnanê bêwar bûne, di nav wan de 400 hezar zarok hene. Ji destpêka şer ve nêzîkî 90 hezar Sûrî vegeriyane Sûriyê digel bi hezaran ji Lubnaniyan.

# Rewşen Bedirxan kî ye?

**Asya Weşûkanî**



Bêguman kar û xebata malbata Bedirxan Beg ji bo, ziman û çanda Kurdî xwedî qîmete û nexasim jî ked û xebata; jina navdar Rewşen Bedirxan ku ji bo ziman û çanda, Kurdî kiriye û weke jineke Kurd tekez kêm nayê dîtin û cihê payebûn û serbilindîyê ye. Rewşen Bedirxan weke jineke xebatkar û rewşenfikir, ji wan jinên Kurd yên ku di ber doza gelê xwe de kar û xebateke; giring kiriye û em ji her kesa\î ku divê babetê de xizmet kiribe re, hurmetê didin raber kirin. Û emê hewildin ku divê nivîsê de li ser kasayet û xebatên, Rewşen Bedrxan xeberdin û wê bi xwendevanên xwe bidin nasîn.

Kurte jiyana Rewşen Bedirxan: Di roja 11- tîrmeha sala 1909 de li bajarê Qeyserê li Bakurê Kurdistanê, ji dayik bû ye. Û di sala 1913 an de fermana Osmanîyan bi ser malbata Bedirxanîyan de, hat û wê hingê temenê Rewşen 4 sal bûye. Di sala 1915 de koça wan ji Îstanbolê barkir û çûne bajarê Şamê. Rewşen li Şamê dest bi xwendina xwe ya dibistanê kir, li dibistana Elteraqî dest pêkirî ye. Û di sala 1924 de ji Instîtûta perwerde kirinê xelas dibe, ango dibe mamoste. Di sala 1925, dibe mamûsta zimanê Erebî. Di ber karê xwe re Rewşen xwe fêrî zimanê Tirkî, Ingilîzî û Firansî jî kirîye. Her li Urdinê û li bajarê Kerek bibû mamûste ya ziman.

Ji sala 1928-1935 an mamostatîyê li bajarê Şamê dike. Di sala 1934 an de dibe endama yekîtîya jinan û di salal 1944 an de pişî kongira Al Qahîre devjê berdide. Di sala 1946 an de dibe dîrktora dibistanê. Di sala 1947 an de dev ji karê mamûstetîyê berdide. Paşê Rewşen li Banyasê nêzîkî derya sipî bicih dibe. Rewşen du caran mêr dike cara yekê sala 1929 an lê temenê vê jiyana bi hev re gelekî dirêj nekir, di sala 1931 de xwe ji mêrê xwe berda. Ji wî mêrî qîzeke wê çêbû navê wê Ûseyma ye. Di dema niha de li bajarê Al Qahîre li Misrê dimîne. Mêrkirina wê ya diwemîn di sala 1935 an de bû, û mêrê wê pismamê wê Mîr Celadet Bedirxan bû.

Du zarokên wan ji hev çêbûn yek bi navê Sînem xan sala 1938 an de çêbûye, û kurek jî bi navê Cemşîd, di salal 1939 an de çêbûye. Jiyana wan bi dijwarî hate buhirandin û bi belengazî û feqîrî bû. Her dîsa di sala 1947 an de Rewşen kar dike di perwerdekirina zarokan de, li Şamê kardike. Karê Rewşen Bedirxan edebiyat û nivîskarî bûye û di dîroka gelê Kurd ya sedê, bîstan de xwedî rolek pir mezin bûye. Û ne xasim di tevgera jinan de. Di gelek konfiransên Cîhanî de Rewşen nûnerîya jinên Kurd kirîye mîna konfiransa ku di salal 1957 an de Antî Kolonyalîzim li Yewnanê. Rewşen bibû nunera Kurdistanê û heft kursîyên wê konfiransê, girtin ji jinên Kurd re, li wir da nasîn rastî û zordestî ya gelê xwe.

Bi alîkarî ya mirovê Ingilîzî, Mekênzî ew konfirans bi serfirazî derbas bû. Di gelek rojname û kovarên Erebî de berhem û gotarên wê dihatin, belavkirin mîna kovara „ Mînerva“ du gotar di kovara Hawarê de belavkirine. Di sala 1951 de pirtûkekê bi navê Bîranînên jinekê. Ji zimanê Tirkî werdigerîne ser zimanê Erebî. Çîrokek bi navê Evîn û derdên min, ji Tirkî werdigerîne Erebî, Nivîskara wê mikrema Kamîle Sê par ji çîroka Bîranînên Mamûstayekê, ji Tirkî tîne zimanê Erebî. Di sala 1954 belavokekê bi navê Rûpelin ji toreya Kurdî bi zimanê Erebî diweşîne. Di sala 1990 dî de Pirtûka Mîr Celadet ya ku ji Mistefa Kemal re nivîsîbû bi zimanê Tirkî, ya bi navê Name, Mektûb, Rewşen werdigerîne zimanê Erebî.

Di sala 1991 de pirtûka bavê xwe ya bi navê Bîranînên min, Salih Bedirxan, çapkirîye, piştî ku ji zimanê Tirkî wergerandî ye zimanê Erebî. Gelek kar li ber wê hebû ji wan ya Bîranînin Celadet Bedirxan bû. Di kat jimêr 4 piştî nîvro, roja 01-06 – 1992 an de li Banyasê dilê Rewşen Bedirxan rawestîya, û li goristana Şê Xalid Neqşbendî, li bajarê Şamê li kêleka Mîr Celadet bi cîwar bû. Li ser jinên Kurd ên wiha têkoşer û kedar weke Rewşen Bedirxan û gelek, jinên qedir bilind hene ku pir nivîs û belgeyên duca li ser jiyan û têkoîna wan tuneye û ji bo hemû jinên; cîhanê jî ev derbas dare û tu belgeyên niviskî û dîdbarî li ser, xebat û têkoşîna wan tuneye û weke ku têye zanîn Rêberê gelê Kurd, Abdullah Ocalan jî li ser vê mijara dîroka jin wiha dinirxîne û dibêje: Dîroka jin nehatiye nivisandin û li benda nivîsê ye û Rêbertî di heman demê de jî dibêje: Wê jinên azad dîroka xwe bidestê xwe, xêzbikin û wê dîroka pêşveçûna mirovahiyê jî were sererast kirin. Em jî weke jin erk û peywira xwe dibînin ku em dîroka xwe ji nude, lêkolîn bikin û ji dûrî siya zilam û hişmendiya wî bi rengekî kûr dîroka; xwe lêkolîn bikin û birengekî rast jî rûpelê wê xêz bikin û bikin malê hemû mirovahiyê.

# ‘Negihîşte kerê, li kurtanî dide’

**Volqan Elî**

Timî em neçar dimînin hawara xwe bigihînin pêşiyên xwe. Wekî Mao’yê rehmetî ji bo gerîla gotiye, “gel deryayeke bê dawî ye û gerîla jî masiyek e di nav de melevanî dike”, bêyî vê em nikarin rewşa heyî bînin ziman. Jixwe gerîla timî li çiyayên bi berf û qerisî dijî, ew karê xwe dike. Armanca me ne ku em li ser wan biaxifin, jixwe herî baş ew bi xwe xwe tînin ziman. Ya me tenê şibandinek e: Têkiliya ku di nava gel û gerîla heye, pir dişibe têkiliya di nava mirov û dîrokê de de; ji ber wê ye ku bêyî ku em serî li dîrokê yan jî li pêşiyên xwe bidin vaye em nikarin rewşa heyî bînin zimên! Di kêliya ku em xwe ji rojên derbas bûyî, ji dîrokê qut bikin em hema mirîne! Ruh ji me kişiyaye.

Çawa mirov nabîhîze! Niha tê guhê min; wekî ku yek bêje: “Tu behsa kîjan rewşê dikî?”. Wele ez rastiyê bêjim heqê we jî heye. Ji ber ku di rojekê de heta di saetekê de ewçend rewşên cuda diqewîmin, nayê zanîn behsa rewşa kîjanê ye! Malûm e; zêdetirî mehekê ye li herêmê şerekî xwînavî dest pê kiriye û didome. Ev şer ne rewşeke nû ye. Ji beriya ku em behsa çend tiştên cuda bikin, em çend gotinan li ser şerî bêjin.

Ya destpêkê; kengî ku şaristanî, dewlet û dagirkerî peyda bûye şer bûye parçeyek ji çarenûsa civakan! Dewlet û ketxwarî, dagirkerî bêyî şer debara xwe nake! Bi şer û alozî û ezme debara xwe peyda dike, çawa ku masîgirek di ava şelo de ji xwe re masî peyda dike û pê debara xwe dike, hêzên hegemon jî hewce dibînin her ezme, tevlîhevî û alozî di navbera civan de li herêmê hebe! Eger aramî û sükûnet û bêdengî hebe ji bo wan ne baş e!

Em nabêjin ji beriya vî şerê dawî li herêma Rojhilata Navîn aramî hebû, lê tevlîheviya heyî jî ji aliyê wan hêzan ve bi vê armancê hatibû derxistin. Werhasil…

Ev şerê di navbera DYE, Îsraîl û Îranê de jî şerekî wisa ye. Hêzên hegemon dixwazin li cîhanê, li herêmê bibin hikumdar û şerê vê dimeşînin! Ji ber vê yekê nabe ku hêzên welatparêz, demokrat ji wan yekê hilbijêrin. Lê belê dîsa pend û şîreteke pêşiyan tê hewara me; “Yek dizekî digire û banî bavê xwe dike. dibêje bavo min dizek girt! Bavê wî jê re dibêje, ‘kurê min bigire û bîne’. Kur ji bavê xwe re dibêje; ‘bavo diz min bernade da ku ez bînim”. Yê me Kurdan jî dişibe vê. Kurdan ji her du aliyên vî şerî re gotin “em naxwazin bikevin şerê we! Lê ew ji me dest bernadin! Bi taybetî Îran! Ayetulahê ji beriya vî rihbihostî, beriya ruhê xwe teslîmî Ehrîman (Xwedayê xirabiyê) bike, gotibû “kokê Kurdan biqelînin”. Yê nû jî daye li ser riya wî. Gotineke pêşiyan heye dibêje ‘Egîdekî bikuje lê heqê wî nexwe!’ Mêrik Trumpî di dawî de gotibû “ez naxwazim Kurd bikevin vî şerî”. Ya rast ti kes nizane ev kowboyê egîd (!) kengî derew dibêje û kengî rast dibêje! Wekî me gotiye şer şerê debare ye; dema em dibêjin ‘debare’ ne debareya çend malbat, êl û eşîran e! Debaraya şîrekeyên cîhanê û li hev parvekirina welatên cîhanê ye! Trumpî hirde kir, virde kir di dawî de li cem Îsraîlê pêlî qirika pergala Ayetulahên Îranê kir. Nayê zanîn ku şer di berjewendiya kîjan aliyî de bi encam bibe. Ev, bi taybetî stratejiyeke DYE ye. Dike ku encamê şer ne xuya be! Mirov ji ber vê yekê ji niha de aliyê Trumpî serkeftî bihesibîne!

Ji bo me, ji bo aliyê seyemîn, aliyê gelan ferq û cudahî tine ku kîjan alî bi ser bikeve û yan bi bin bikeve. Ya ku bi taybetî em Kurd dixwazin, em ê aliyekî ji van aliyan hilnebijêrin! Lê stratejiya me Kurdan jî heye; çi dibe bila bibe em ê gelê Kurd ji êrîşan biparêzin.

Ji ber vê yekê wekî me gotiye bi taybetî jî Îran, ji ber ku ji dijminê xwe pir darbên xeder girtiye dîn û har bûye! Li vir sarox û li wir sarox… hêza wî têra dijminê heftserî nake, bela xwe li Kurdan dide.

Herî dawî di 24’ê meha Adarê de bi sarox û dronan êrîşê biryargeha pêşmergeyan kir. Gelek pêşmerge şehîd bûn û gelek birîndar ketin. Tevî ku Îranê daxuyaniyeke fermî nedaye jî ev di helwesta Ayetulahê çûyî û hêzên leşkerî yên Îranê de aşkere dike!

Çi dibêjin, “Negihişte kerê, li kurtan dide”. Helwesta Îranê vê tîne bîra mirov!



# ‘Em bi hişmendiya Mazlûman û ruhê Mahsûman têkoşîna xwe berdewam dikin’

HPG’ê Hefteya Qehremaniyê pîroz kir û got, “Bi têgihîştina ku layiqê şehîdan bin, li ser şopa lehengan bimeşin û bi ruhê fedaîbûnê û rêbazên dewlemend hîn bi hêztir têbikoşin, biryardariya xwe ya ji bo misogerkirina azadiya Rêber Apo tînin ziman.”

**Navenda Nûçeyan**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê, bi daxuyaniyekê Hefteya Qehremaniya Neteweyî pîroz kir.

Daxuyaniya HPG’ê bi vî rengî ye:

“Em gelê xwe û dostên gelê xwe yên ji heft salî heya heftê salî berê xwe dan qadan û Newroz bi ruhê berxwedanê pêşwazî kirin, bi coşeke mezin pîroz kirin, rastiya gelê Kurd a berxwedêriyê nîşanî hemû cîhanê dan, yekîtiya neteweyî nîşan dan, disozî, hesret û daxwaza azadiya ji bo Rêber Apo bi awayê herî xurt qîr kirin bi dil û can silav dikin û Cejna Newrozê li wan pîroz dikin.

Hevrê Mazlûm Dogan ê Kawayê hemdem, li dijî êşkenceyên dermirovî yên li Zindana Amedê di 21’ê Adara 1982’yan de şeveke Newrozê berxwedaniyeke mezin nîşan da û çalakiyeke lehengiyê ya mezin li dar xist. Hişmendî, biryardariya şoreşgerî, kesayeta xurt, hevrêtiya heqîqî û çalakiya wî ya Newrozê ya hevrê Mazlûm Dogan ê kadroyê pêşeng ê Tevgera Apoyî, ew kiriye haveynê hişmendiya têkoşîna me, ruhê berxwedanê, xet û nasnameya wê. Ruhê berxwedana Newrozê yê Mazlûm Dogan nasname, hişmendiya neteweyî û xîreta têkoşînê daye gelê Kurd, çirûska ku bi sê niftikan vêxist roja îroyîn veguheriye agirê azadiyê yê ji aliyê milyonan însanan ve tê geşkirin. Ger roja îroyîn bi rastî jî Newroz li gorî wate, têkiliya xwe ya dîrokî û cewhera xwe tên pêşwazîkirin û kelecan, coş û ruhekî dide gelê me û ya herî girîng jî ger gav bi gav azadiyê bi xwe re bîne ev yek bi saya lehengiya Mazlûm Doganan e.

Fermandarê efsanevî yê Gerîlayên Azadiya Kurdistanê hevrê Mahsûm Korkmaz, weke yek ji hevrêyên Mazlûm Dogan ê herî dilsoz xeta berxwedana PKK’ê ya li Zindana Amedê gihandiye çiyayên Kurdistanê. Fermandar Egîd, li çiyayên Kurdistanê gerîlatî daye destpêkirin, fermana înkar û tunehesibandina gelê Kurd qetandiye, Pêngava 15’ê Tebaxê ya Gewre pêk aniye û dengê berxwedêrên Apoyî li seranserê cîhanê daye bihîstin. Sekna lehengiyê ya hevrê Egîd, şerê hebûnê yê gelê Kurd ê ku dihat xwestin ku were tunekirin, kiriye û ji tunebûnê ber bi vejînê ve biriye. Mîrateya ku Fermandar Egîd ê ku li Kurdistanê ji pêdiviya pêşxistina têkoşîna gerîlayan bawer kir û pêşengtiya vê têkoşînê kir û ji me hişt, li Kurdistanê rastiya civaka ji bo azadiya xwe şer dike, derxist holê û bi deh hezaran ciwanên şopdarên Egîd bi baweriya serkeftina vê têkoşînê tevlî têkoşînê bûne. Apoyîyan ruh û xeta berxwedana li Zindana Amedê veguherandin terzê gerîlatiyê û li gel bedêlên mezin têkoşîneke ku nîvsedsalê berdewam kir, dane meşandin û bi hezaran leheng afirandin.Helwesta bi disîplîn, wêrek û bi biryar a hevrê Egîd di xeta Rêber Apo de, di serketina berxwedanê de roleke girîng lîst. Ev sekn bi herêmekê ve sînordar nebû; bandor li seranserê Kurdistanê û li her deverê ku Kurd lê dijiyan kir. Helwest û ruhê qehremaniyê yê hevrê Egîd ji bo azadiya gel bû hêzek xurt. Ji ber vê yekê, ew ê her tim wekî lehengek were bîranîn.

Gelê Kurd ê welatparêz di navbera 21’ê Adarê û 28’ê Adarê de roja ku hevrê Mazlûm Dogan çalakiya xwe ya qehremaniyê pêk anî û roja ku hevrê Mahsûm Korkmaz di 28’ê Adara 1986’an de li Gabarê şehîd bû wek Hefteya Qehremaniya Neteweyî pîroz dike. Hevrê Mazlûm û Mahsûm nirxên birûmet in ku dîroka qehremaniya hemdem a gelê me dane destpêkirin, wekî kesayetên sosyalîst û birûmet ku hişmendî, wêrekî û îradeya Apoyî herî bi hêz tê de cih digire. Hevrê Mazlûm û Mahsûm ku navên xwe di dîroka Kurdistanê de wek lehengên mezin, sembolên ruhê azadiyê, şoreşgerî û qehremanên bêhempa nivîsandine, çawa ku bi dehan salan e weke meşaleyên têkoşîna azadiya neteweyî ya gelê me tu carî venamirin, îro jî rêya me ronî dikin. Li ser vê bingehê em Hefteya Qehremaniyê ya gelê xwe yê welatparêz ê Kurd û hemû hevrêyên xwe ku bi ruhê Apoyî yê fedaî di her qadê de têkoşîna xwe dimeşînin, pîroz dikin. Em hemû şehîdên xwe, bi taybetî jî qehremanên xwe yên neteweyî, bi hurmetî, hezkirin û minetdarî bi bîr tînin. Em diyar dikin ku em ê di bin her şert û mercî de bi biryardarî şopdarê rêya şehîdên xwe bin.

Weke Gerîlayên Azadiya Kurdistanê îro em bi hişmendiya Mazlûman û ruhê Mahsûman ji bo parastina erkên xwe yên li ser xeta Apoyî, têkoşîna xwe berdewam dikin. Bi têgihîştina ku layiqê şehîdan bin, li ser şopa lehengan bimeşin û bi ruhê fedaîbûnê û rêbazên dewlemend hîn bi hêztir têbikoş in, biryardariya xwe ya ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo tînin ziman.”

Em gelê Kurd ku bi biryardarî li ser şopa qehremanên xwe dimeşin, bi hêzek mezin Cejna Newrozê pîroz dikin û qehremanên xwe bi hurmetî bi bîr tînin, silav dikin. Em careke din Cejna Newrozê û Hefteya Qehremaniyê li gelê xwe yê welatparêz û hevrêyên xwe pîroz dikin û di têkoşîna wan a azadiyê de serketinê ji wan re dixwazin.”

# NY rapora binpêkirinên Siwêdayê belav kir

**Reşo Mihemed**

**Neteweyên Yekbûyî rapora xwe ya derbarê komkujiyên Siwêdayê belav kir. Li gorî raporê, hezar û 190 mêr, 99 jin, 53 zarok ji pêkhateya Durzî hatin kuştin, 53 mêr, 9 jin, 5 kur û 3 keç ji Erebên çolger hatin kuştin.**

Di 27’ê Adarê de Neteweyên Yekbûyî ya têkildarî komkujiyên ku sala borî li Swêdê pêkhatine, raporek dirêj û berfireh e ji 85 rûpel pêktê, belav kir. Jêdera vê raporê 409 kes in, ew jî şahidên rasterast ên ku ji binpêkirinan hatin rizgarkirin û şahidên ji civakên cihêreng ên ku bandora şer li wan bûye, ji bilî serdanên qadê yên berfireh ên deverên herî zêde bandor li wan hatine kirin, pêktê.

**Pêla yekem, duyem û sêyem ji êrişan li gorî raporê**

Pêla yekem ji êrişên li ser Siwêdayê ya herî bi tund bû, hêzên hikumeta demkî û komên çekdar ên girêdayî êlên Ereban binpêkirinên herî xerab li ser gelê Durzî pêkanîn, ev binpêkirin jî dûrî zagonên navdewletî yên cîhanî yên mafên mirovan pêkhat. Di serî de hêzên hikumeta demkî mêrên Durzî ji jinan cuda kirin û ew li qadan kuştin, hem jî gelek ji mêran li kolan û li nav sivîlan dan kuştin. Pêla yekem ji êrişan ji 14 heta 16’ê Tîrmeha 2025’an li ser rojavayê Siwêdayê û navenda bajêr domand. Pêla duyemîn ji êrişan di 17’ê heman mehê hat destpêkirin. Di encamê de komên çekdar ên Durzî êrişî sivîlên Ereb ên Siwêdayê kirin û binpêkirin dijî wan dan meşandin. Pêla sêyem ya herî wêrankar bû ku ji hêla çekdarên eşîreyên Ereban ve di dawiya 17 û 19’ê Tîrmeha sala 2025’an de pêkhat, êrişkaran dîsa sivîlên Durzî armanc girtin, bi piraniya mal, firoşgeh û cihên olî li nêzîkî 35 gundên ku piranî Durzî an jî tevlihev in hatin şewitandin û talankirin di heman demê de sivîl hatin kuştin û revandin. Hin endamên hêzên hikûmetê piştî ku çekên wan yên leşkerî ji wan hatin kirin, tevlî êrîşan bûn. Destwerdana leşkerî ya Îsraîlê di vî şerî de wekî ku komîteyê diyar kir û hewldanên berê di warê astengkirina karê hikûmetê de ne tenê bû sedema mirin û birîndarbûnê, lê di heman demê de bû sedema bêaramî û sedema zêdebûna tawanbariyên xiyanetê li dijî rêberên Durzî, herweha teşwîqkirina nefret û êrîşên tolhildanê yên li dijî tevahiya Durziyan.

**Encama kiryaran**

Her pêlek tundûtûjiyê bi heqareta mezhebî yên li dijî sivîlên Durzî û Ereb re dihat, komîteyê şêwazên zelal ên armancgirtinên li ser bingeha nasnameya olî, temen û zayendî destnîşan kir. Di raporê de hat diyarkirin ku hemû civakên herêmî banga edaletê û nûkirina têkiliyên di navbera mezheban de kirin. Hikumetê soza berpirsyariyê da, destûr da komîteyê ku bigihîje Siwaydayê û desteyek ava kir, di van demê de girtina 23 karmendên ewlekariyê û artêşê ragihand, lê tenê zanyariyên kêm derbarê lêpirsînên li ser berpirsiyariya rêveberiya hêzên hikumeta demkî hatin eşkerekirin. Li gorî raporê, 1190 mêr, 99 jin, 53 zarok ji pêkhateya Durzî hatin kuştin, 53 mêr, 9 jin, 5 kur û 3 keç ji Erebên çolger hatin kuştin. Piraniya wan sivîl an jî kesên ku di wê demê de tevlî şer nebûn bûn. Herî kêm 225 çekdarên hikumetê, gelek ji wan di êrîşên esmanî yên Îsraîlê de hatin kuştin. Li gorî raporê, kiryarên tundûtûjiyê bi rengekî zayendî hatin belgekirin, ji ber ku mêr û kur bi taybetî hatin armanckirin. Pêkhateya Durzî û Erebên Siwêdayê bûyerên tundûtûjiya cinsî li dijî jin û keçan eşkere kirin. Di heman demê de lêkolîn berdewam dikin ku tevahiya van binpêkirinan derxînin holê.



**Bangewaziya Neteweyên Yekbûyî**

Di nava raporê de Neteweyên Yekbûyî destnîşan kir ku Siweyda bi kûrahî parçe bûye û diyaloga siyasî qut bûye. Xetên kontrolê ji 19’ê Tîrmeha 2025’an ve neguheriye û pevçûn hîn jî berdewam in. Di nav nêzîkî 200 hezar kesên ku di meha Tîrmeha sala bûrî de koçber bûne, nêzîkî 155 hezar kesî piranî ji gundên Durzî yên şewitî, hîn jî nikarin vegerin malên xwe. Hemû nifûsa Ereb bi darê zorê koçber bûne û gelek ji wan piştî heşt mehan di şert û mercên nebaş de dijîn. Rapor bang li hewldanên xurt kir ji bo misogerkirina berpirsyariya berfireh, hem jî peydakirina garantiyên berbiçav û girtina tedbîran ji bo bûyerên xerab dubare nebin, kir. Di heman demê de raporê xwest ku lihevhatin û avakirina baweriyê, dûrketina ji axaftina nefretê pêkwere. Ji civaka navnetewî xwest ku piştgiriyê bide hikûmetê di cîbicîkirina pêşniyarên komîteyê de. Her wiha bang li aliyên derve, di nav de Îsraîl, kir ku kiryarên ku dikarin bibin sedema bêîstîkrarî û zirarê bidin sivîlan rawestînin.

Di raporê de Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku Komîsyona Navneteweyî ya Serbixwe ya Lêpirsînê ya Sûriyê di 22’ê Tebaxa 2011’an de ji aliyê Meclisa Mafên Mirovan ve hate damezirandin. Erkê Komîsyonê ew e ku lêpirsîna hemû îdîayên binpêkirina hiqûqî ya mafên mirovan a navnetewî ku ji Adara 2011’an ve li Sûriyê pêkhatine, bike. Meclisa Mafên Mirovan ji wê demê ve gelek caran erkê Komîsyonê dirêj kir, herî dawî heta 31’ê Adara 2026’an.

# Li Rojhilata Navîn şer û aştî

Rojhilata Navîn ji destpêka sedsala 20'an ve bûye qada şer û nakokiyên herî giran ên cîhanê. Di çarçoveya şer û aştî de pêvajoya aştiyê ya 27'ê Sibatê ku ji aliyê Rêber Apo ve hat destpêkirin, ew nimûneyek girîng a hewldanên çareseriyên siyasî li tevahî herêmê ye, her çendî şertên herêmê pir aloz in, lê ev nîşan dide ku di nav şertên şer de jî, dibe ku deriyên aştiyê bên vekirin.

**Ronahî Sadûn**

Rojhilata Navîn, herêmeke ku bi dîrokek dirêj, çandek zengîn û cihên stratejîk tê nasîn, di heman demê de ji bo gelek şer û kirîzên siyasî jî tê naskirin. Ji destpêka sedsala 20'an ve, ev herêm bûye qada şer û nakokiyên herî giran ên cîhanê. Piştî hilweşîna Împaratoriya Osmanî di dawiya şerê yekem a cîhanê de, sînorên Rojhilata Navîn bi destê hêzên rojavayî wek Brîtanya û Fransa hatin çêkirin. Ev sînor bi gelemperî bêyî ku cihrengiya etnîkî û olî li ber çavan bê girtin, hatin danîn ku bû sedema gelek nakokiyan di salên paşîn de. Lewma gelek welatên vê herêmê di şertên neasayî de hatin damezrandin.

### Rola hêzên derve

Rojhilata Navîn her dem bûye cihê balkêş ji bo hêzên mezin yên cîhanê. Amerîka, Rûsya û Ewropa di siyaseta herêmê de rola girîng hene. Ev destwerdanên derve gelek caran bûne sedema dirêjkirina şeran û nehatina çareseriyên berdewam. Her hêz bi armancên xwe yên stratejîk, aborî û siyasî tevdigere ku ev jî nakokiyan zêdetir giran dike. Herwiha şerên li herêmê bandorên mezin li ser gelên herêmê hene heya roja îro heye û berdewam e.

### Perspektîfa siberojê

Siberoja Rojhilata Navîn girêdayî gelek faktorên cihêreng e. Çareserkirina nakokiyên sereke, girîng e ji bo aştîya demdirêj û mayînde. Herwiha, hewldanên ji bo pêşvebirina aborî û çêkirina rêveberiyekî baş dikare bibe bingehê aramiyê. Di heman demê de, rola civaka navneteweyî jî girîng e. Heke hêzên mezin karibin bi hev re bixebitin û ne ku li dijî hev, dibe ku şertên baştir ji bo aştî çêbibin. Lê heke nakokiyên wan berdewam bin, ew ê şer dirêj bike û alozî mezintir bibe.

### Pêvajoya aştiyê bingeha guherandina şerê çekdarî ji bo rêyên dîplomatîk û siyasî

Di çarçoveya şer û aştî di Rojhilata Navîn de, pêvajoya aştiyê ya 27'ê Sibatê ku ji aliyê Rêber Apo ve hat destpêkirin, ew nimûneyek girîng a hewldanên çareseriyên siyasî li tevahî herêmê ye. Ev pêvajoyek ku di şertên dijwar de hat avakirin, li ser bingeha guherandina şerê çekdarî bo rêyên dîplomatîk û siyasî radiweste ku ev jî bi şertên herêmê re girêdayî ye.

Ev pêvajo armanc dikir ku nakokiya dirêj ên di navbera dewleta Tirk û Tevgera Azadiya Kurd û gelê Kurd giştî de bi rêya diyalog û danûstandinan were çareser kirin. Di vê pêvajoyê de, bangehên aştiyê, rawestandina şer û guherandina rêbazên têkoşînê hatin kirin. Ev nêrîn li ser wê bingehê bû ku çareseriya rastîn ne tenê bi hêza leşkerî, lê bi çareseriyên siyasî, mafî û civakî tê. Ev model dikare li Rojhilata Navîn giştî de were sepandin, ji ber ku piraniya nakokiyan li herêmê bi heman awayî hene: Nakokiyên nasnameyî, olî û siyasî ku bi şerên dirêj hatine alozkirin.



### Pirsgirêkên Rojhilata Navîn ne tenê leşkerî ne!

Dema ku em li şerên li herêmê dinerin, em dibînin ku pirsgirêkên wan ne tenê leşkerî ne. Wek nimûne, li Sûriyê gelek aliyên şerker hene ku her yek daxwazên xwe yên siyasî û nasnameyî hene. Heke pêvajoyek mîna ya 27'ê Sibatê bi awayekî rast were sepandin, wê rê li ber çareseriyên dîplomatîk were vekirin. Herwiha yek ji aliyên girîng ên vê pêvajoyê ew e ku şer ne wek çareseriya yekem tê dîtin. Ev nêrîn bi gelemperî li Rojhilata Navîn kêm tê dîtin, ji ber li herêmê gelek dewlet û kom, şerê çekdarî weke yek ji rêya sereke dîtine. Lewra ger ev felsefe li herêmê berfireh bibe. dibe ku rê li ber diyalogên navneteweyî were vekirin û rola civaka sivîl zêde bibe. Ev hemû dikare şertên aştiyeke mayînde çêbike.

### Astengiyên li pêş aştiya Rojhilata Navîn

Lê girêdana vê pêvajoyê bi şertên herêmê, ne bê asteng e. Li Rojhilata Navîn, destwerdana hêzên derve zêde ye. Bêbawerî di navbera aliyên şerker de hene. Pirsgirêkên nasnameyî pir kûr in, ev hemû faktor dikarin pêvajoyên aştiyê qels bikin an jî rawestînin. Wek ku di pêvajoya 27'ê Sibatê de jî hate diyarkirin, bêyî piştgirîya siyasî ya domdar û şertên guncav, aştî nikare berdewam bimîne. Di encamê de, pêvajoya aştiyê ya 27'ê Sibatê dikare wek nimûneyek ji bo şopandina rêyên nû yên çareseriyê li Rojhilata Navîn were nirxandin. Ev pêvajoyek ku li ser diyalog, siyaseta demokratîk û mafên mirovan radiweste, dikare hînkirinek girîng bide herêmê. Her çendî şertên herêmê pir aloz in, lê ev mînaka nîşan dide ku di nav şertên şer de jî dibe ku deriyên aştiyê bên vekirin. Aştî ne tenê encama rawestandina şer e, lê pêvajoyek dirêj e ku hewceyê îradeya siyasî, bawerî û hevkariyê ye.

Derbarê vê mijarê de, nûnera Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Leyla Mûsa ji Rojnameya me re axivî.

### 'Pirsgirêkên Rojhilata Navîn ne tenê leşkerî ne'

Leyla Mûsa diyar kir ku Rojhilata Navîn ji nû ve tê xêzkirin û pirsgirêkên wê ne tenê leşkerî ne û wiha got: "Rojhilata Navîn bi wateya rastîn nehatiye wêrankirin, wekî ku di ravekirinan de tên nîşandan. Berovajî vê, ew hatiye hilweşandin û berdewam dike ku were hilweşandin, hem jî nexşeyên wê hêdî hêdî ji nû ve têne xêzkirin. Pirsgirêk êdî ne tenê pevçûnên leşkerî ne ku li vir û wir derdikev in, lê bûye pêvajoyek dirêj a xetmandinê li dijî dewletan, civakan, baweriya di navbera komên wan ên pêkhatî de û heta ji ramana siberojeke ewle re jî. Tiştê ku di 10 salên borî de li herêmê rû daye, rastiyek afirand, Dewletên ku xort xuya dikin, ji hundur ve qels in. Herwiha civakên li ber xizaniyê bi fikaran dijîn û aboriyên ku bi zorê dikarin li hember her şokê bisekinin. Ev ne bi tesadûfî çêbûye, ji ber her çiqasî hêzên mezin her gav li dû wêrankirina rasterast nebin, lê belê armanc dikin ku herêmê bi awayekî birêve bibin û wê di bin kontrolê de bihêle, bêyî ku bihêle bi tevahî baş bibe. Armanca sereke ji vê jî ew e; Dispilînkirina hevsengiya hêzê were kirin, berjewendî were parastin, çavkaniyên enerjiyê werin dabînkirin û pêşî li derketina hêzên serbixwe yên ku dikarin rêgezên destnîşankirî biguherînin, were girtin. Ji ber vê yekê, em dibînin ku hin nakokî çareser nabin, ji ber di dawiyê de ew xizmetê ji planên mezintir û pêşwext diyarkirî re, dikin."

### 'Aştî ji ber nebûna raman têk naçe, lê ji ber berjewendiyên nakok'

Leyla Mûsa eşkere kir ku aştî li Rojhilata Navîn ji ber berjewendiyên nakok têk diçin û wiha anî ziman: "Ezmûna dîrokî me fêr kiriye ku destpêşxerî yan jî insiyatîfên aştiyê li Rojhilata Navîn pir caran di nav odeyên dîplomatîk ên bêdeng de çêdibin, lê bi lez û bez bi pêşektinên li ser rûyê erdê re rû bi rû dimîne. Di pratîkê de, çar aliyên sereke hene ku pêşengiya van destpêşxeriyan dikin: Neteweyên Yekbûyî, hêzên navneteweyî yên sereke, hin dewletên Erebî yên girîng û aktorên herêmî yên ku rola navbeyinkar dilîz in. Lêbelê, pirsgirêk ne nebûna destpêşxeriyan e (insiyatîfan e), lê nebûna îradeyek têr e ku ew biserkev in. Piraniya caran, nakokî derdikevin ji ber ku her alî bi hesabên xwe dikeve danûstandinan, hin bawer dikin ku ew hîn têk neçûne, hin ditirsin ku heke îmze bikin bêtir winda bikin û hinan bandora xwe li ser berdewamiya pevçûnê ava kirine. Têbîniyeke din a girîng di gelek destpêşxeriyan de ev e ku ew bi zelalî bersiva pirsa "roja din" nadin û wan bêtir wekî çareseriyên demkî ji çareseriyên rastîn xuya dikin. Bi kurtasî, aştî li Rojhilata Navîn ji ber nebûna ramanan an nebûna îradeyek gel têk naçe, lê ji ber berjewendiyên nakok."

### 'Aştî wê rewşa herêmê giştê biguherîne'

Leyla Mûsa tekez kir ku bi pêkanîna aştiyê wê rewşa herêmê giştî bê guhertin û wiha bilêv kir: "Ger aştî pêk were, yekem tiştê ku dê biguhere rewşa giştî ya herêmê ye. Asta tirsê kêm bibe, aborî dê dest bi xebata normal bike û têgeha dewletê dê wekî hêzek yekgirtî ne wekî qadeke pevçûnê, vegere. Di vê rewşê de, em ê bibînin ku istismarat vedigerin, ciwan dê li şûna koçberiyê li ser avakirinê bifikirin û welat dê hewlên xwe ji nû ve binirxînin ku ji nêzîkatiyên ewlehî û leşkerî wêdetir biçin. Ya herî girîng, tevahiya herêmê dê ji rewşa hilweşîna domdar a ku ew bi salan e dijî, derkeve. Lêbelê, ger şer berdewam bikin, em ber bi Rojhilata Navîn a ku bêtir westiyayî, parçebûyî, tevlihev, xizan û wêranbûyî ye, diçin. Di vê senaryoyê de, em ê şahidiya hilweşîna gav bi gav a ramana dewletê bikin, koçberî dê zêde bibe, panaberî dê du qat bibe, çîna navîn biçûk bibe û îdeolojiyên tundrew dê zemînek berhemdartir bibînin. Ya hîn xeternaktir ew e ku şer êdî herêmî nînin, ji ber her pevçûneke mezin a îro di hundirê xwe de veguhertina kirîzeke herêmî ya berfireh û dibe ku ji wê jî wêdetir jî, heye.

### 'Serkeftina pêvajoyê îradeyek siyasî ya domdar hewce dike'

Leyla Mûsa di domandina axaftina xwe eşkere kir ku pêvajo ne tenê insiyatîfeke taktîkî ye, lê hewldanek e ku pevçûn bi xwe ji nû ve were pênasekirin û wiha got: "Çi nerînên cuda li ser Rêber Apo hebin û çi ji alîgir an dijberên wî bin, nayê înkarkirin ku rêbertî di hevkêşeya Kurdan de, nemaze di nava Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de, kesayetiyek bi bandor dimîne. Pêşniyarên dawî yên Rêber Apo, çi banga bêçekkirinê bin an jî pêkanîna pêvajoyek siyasî, têgihîştinekê nîşan dide ku pevçûnên dirêjkirî nikarin bêdawî berdewam bikin. Ev ne tenê insiyatîfeke taktîkî ye, lê hewldanek e ku pevçûn bi xwe ji nû ve were pênasekirin. Girîngiya vê gavê ji Tirkiyê wêdetir diçe. Her kêmkirina rageşiyê di vê mijarê de, dê bandorê li ser bakurê Iraq û Sûriyê, hem jî li ser xwezaya têkiliya di navbera dewleta Tirk û civakên Kurd ên li herêmê de, bike. Bi gotineke din, em bi dosyayekê re rûbirû ne ku ger pêşve biçe, dê pirsgirêkên din jî pê re çêbike. Lêbelê, divê em rast bin. Serkeftina vê pêvajoyê ne garantî ye, ji ber ku bidawîkirina pevçûnek bi vî rengî ji daxuyaniyên niyetê bêtir hewce dike; ew ji hemû aliyan bawerî, garantî û îradeyek siyasî ya domdar hewce dike."

### 'Ji bo dawîbûna şer cesareta siyasî hewce dike'

Leyla Mûsa axaftina xwe wiha qedand: "Niha herêm li ber berfirehkirina pevçûnan e, ne tenê berdewamkirina wê. Ji ber vê yekê, pêşîniya wê ne birêvebirina şer e, lê pêşîgirtina li ber berfirehbûn û belavbûna wê li qadên din e. Her çendî bicîhanîna wê dijwar be, lê tiştê ku divê were kirin zelal e, ew jî ev in: Rawestandina zêdebûna pevçûnan li deverên germ, vekirina têkiliyên rasterast û nerasterast di navbera dijberan de, karkirina ber bi têgihîştinên demkî ve ku rê li ber ketina pevçûnek tevahî bigirin. Lêbelê, heke sedemên bingehîn ên kirîzan neyên çareserkirin, ev hemû dê ne bes bin. Agir nayên vemirandin heya ku sotemenî di damarên pirsgirêkên heyî de, diherike. Rastiya îro piştrast dike ku pêşîgirtina li şerên siberojê ne tenê hewceyî dîplomasiya çalake, lê di heman demê de cesareta siyasî jî hewce dike ku çareseriyên rastîn qebûl bike, ne yên paşxistî an çareseriyên demkî."

FENER



Idrîs Henan

## Tabloya Li Herêmê Ne Sade Şer e, Ne Jî Aştiyeke Zelal e!

Aqil dibêje; mirov bi jêhatiya xwe dikare rêjeyeke birûmet a hebûnê biparêze. Lewra; ne her kes û aliyên ku di şeran de bi ser dikevin, pêşerojê diyar dikin, lê belê yên xwe ji bandorê xilas bikin û di hevsengiyên nû de cih digirin, ew bi ser dikevin.
Li ser wê bingehê dikare were gotin ku îroj herêm sanciyên zayîna hevsengiyên nû jiyan dike û encamên derkevin jî şer û pevçûnê naqedînin, lê belê nîşaneyên zayîna sîstemek nû ya herêmî ne.
Bi geşedanên bilez ên li Rojhilata Navîn re, bêguman diyar dibe ku pevçûn ne bi awayê leşkerî yê klasîk e. Tişta têye jiyîn; kêliyên dîrokî yên di bin zextên diyalog û barûdê de hevsengiyan vesaz dikin e. Li gorî dane û deteyên şer û pêşketinan, hişyarî û analîzan, diyar dibe ku herêm li ber keviyên dîzayîn û ferzkirina realîteyên nû ye.
Bi gotinek din; şer û pevçûnên di navbera DYE, Îsraîl û Îranê de, ne tenê rûbirûkirinek leşkerî ye, lê belê pevçûneke li ser; Kî wê xêza dawî ya şer binivîse ye?
Amerîka ji aliyê xwe ve hewl dide van pevçûnan biçewisîne û pencereya lihevkirina ji jor ve vekirî dihêle ku neşimite şerekî vekirî yê demdirêj. Îsraîl jî dixwaze bi agir mercên serweriyê bixe gerantiyê. Di vê heyamê de; Îran jî di navberê de maye û bi hemû hêza xwe hewl dide ku hilneweşe. Lewra jî nameyên cuda ji hundir û ji derve re dişîne. Li hundir ala berxwedanê hil dide û li derve jî cokên nepenî yên diyalogê vedikole û çarçoveyek siyasî yê sînordar ji ihtîmala têkçûna xwe re amade dike.
Di vê rewşa tevilhev de, Kendav weke aktorek sereke derdikeve pêş. Li gorî çavdêran; welatên Kendavê beramberî du sînaryoyên metirsîdar in. Eger Îran bi ser keve, wê beramberî Kendavê hegemoniya herêmî be. Eger bi bin keve jî, wê deriyên kaoseke bêserûber vebin. Ji ber vê yekê jî, heya vê kêliyê dûrî pevçûnan sekiniye û ji bo aborî û aramiya xwe biparêze, xwe ragirtiye.
Li gorî nexşeya fireh a şer û pevçûnan, Herêma Kurdistanê ku di bin zextên Tirkiyê, Îran û Îraqê de ye, di pozisyonek xetere de ye ku her kêliyê gengaze bibe qadeke safîkirina hesabên hêzan, taybet ku di cografyaya kaosê de ti eniyên zelal ên pevçûnan diyar nebûne.
Di nav circireke wisa de mirov nikare bandorên hundirîn li welatekî fena Sûriyê û Rojava de ji nedîtî ve binêre. Rewşa bêserûber li Sûriyê ku li ser hinek lihevhatinên demkî yên bê gerantî çêbûne, taybet gerantiyên destûrî û hiqûqî, herêmê sabote dike û kîjan deqê be dibe aramiya heyî biteqe.
Tevî ku rola Kurdan bi têkoşîna Rojava re berbiçavtir û bandortir bûye, lê dîsa jî divê ew yek di çarçoveya yekîtiya neteweyî de were tekûzkirin. Îroj gelê Kurd li herêmê veguheriye aktorekî siyasî yê sereke. Sînorên cografîk derbas kiriye û xwedî senteza altirnatîf a ezmûna birêvebirina demokratîk ê çandên Rojhilata Navîn e. Ji ber vê xisûsê, mirov nikare ezmûna Rojava li gorî çarçoveyek teng binirxîne, lê belê altirnatîfa birêvebirina nenavendî, pirengî û pêkvejiyanê ye.
Tevî hemû zehmetî û skandalan, rengên otorîter ên sîstemên netewperest, Îslama siyasî ya radîkal û desthilatdariyên navendî, Rojava xwedî rabirduya birêvebirina aram û bi ewle ye. Aşîtiya civakî parastiye, rêveberiya xweser pêş xistiye û cudahiyên civakî hembêz kiriye. Ji ber wê jî xwedî potansiyel û enerjiya avakirinê ye. Ji lew re nabe beşek projeyên hegemoniya navdewletî û ne jî dibe parçeyek pevçûnan.
Di encamê de; tabloya tevlihev a li herêmê tê xêzkirin, ne sade şer e ne jî aşîtiyeke zelal e. Encama derdikeve jî, li gorî şîdetê û hewcedariyan e. Hemû alî bawer dikin ku nikarin serkeftinek mutleq bi dest bixin, lê heya ji wan tê wendayiyan kêm dikin û şert û mercên diyalogê baştir dikin. Lê divê were zanîn ku encam êdî tenê bi terazuyên hêzê yên klasîk re nayên bidestxistin, lê belê bi tevlîbûna modelên altirnatîf ên rêveberiyê re ye encam temam dibin. Di vê derbarê de; Rojava jî ezmûna herî girîng û kilîta hevsengiya civakan e.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**



Nivîskar Biradost Mîtanî: "Pîroya dîroka Kurd li Rojava"

Wêjeya Kurdî stûneke bingehîne di tevgera neteweyî ya Kurd de , û bûye amûrek ji bo îfadekirina nasname, çand û dîroka gelê Kurd, û jêderek girîng di bihêzkirina nasnameya neteweyî ya Kurdan de, ku di dîrokê de di navbera çend welatên Rojhilata Navîn de dabeş bûye.

Nivîskar û helbestvan di refên herî pêş ên tevgera neteweyî de bûn, pênûsên xwe ji bo pêşvebirina zimanê kurdî, parastina dîrokê, vejandina mîras û belgekirina têkoşîna gelê kurd a ji bo serxwebûn û azadiyê bi kar anîne.

Di vê çarçoveyê de nivîskar û dîroknas Biradost Mîtanî yek ji afrînerên herî diyar derdikeve pêş, ku bi lêkolîn û vekolînên xwe yên li ser şûnwarên arkeolojîk rastiya dîroka kevnar a Kurda vegerandiye, û wêneyekî zindî yê şaristanî û çanda gelê Kurd di heyamên kevnar de pêşkêş kiriye.

Nivîskar û dîroknasê Kurd Ebdul Hekîm Mela Omer naskirî bi navê (Biradost Mîtanî) di sala 1960'an de ji dayîk û bavek Kurd (Mela Omer û Seyran) li gundê Xirbê Cihiwa yê dikevê bakurê Cilaxa yê girêdayî navçeya Dêrikê ji dayîk bûye.

Ev bajarê ku jêdera şaristanî û dîroka kevnar tê dîtin, wekî stêrkeke sermedî

li Deşta Hesina dibiriqîne û pala xwe dide sînorên Bakur, Rojava û Başurê Kurdistanê , û çemê Dîcle wan ji hev vediqetîne û hesreta yek xakê û bîranîna hevpar wan li hev dicivîne .

Ew hevcêwiya Zaxoka Bahdînan û Cizîra Botanê ye, dergûşa olên esmanî û çavkaniya çandên cihêreng e, ku li peravên wê ziman, nimêj û lavij digihêjin hev û ji destpêka dîrokê ve li wir ol û netewan hevdû hembêz kirine, xaka wê mîrateya Mîtaniyan û Mediyan hildigire û ji deverên wê bênxweşiya Bedirxaniyan û Botaniyan jê dibarin ,

yên ku ala raman , raperîn û azadiyê bilind kirine, û pênûs kirine xetîreya ku tarîtiya dîrokê ji holê radike.

Di vî bajarî de komek nivîskar û helbestvan hatine dinyayê wek Ehmed Şêx Saleh, Omer Lalî, Lorî Teldarî, Şehîd Zerdeşt û nivîskarên din ku peyv kirine pirek di navbera bîr û nasname, paşeroj û xewna bê de.

Biradost li ser vê xaka pîroz di nava malbateke Kurdperwer, neteweyî, oldar û kedkar a ku ji sê bira û du xwişkan pêk dihat, mezin bûye.

Ew di maleke tije ji nirxên resen ên kurdewarî, prensîbên olî û hezkirina ax û welat de xwedî bûye . Dêrik ji bo wî bû dergûşa bîr, nasname û rehjena neteweyî.

Biradost zarokatiya xwe li kuçeyên gundê xwe, ku bêhna nanê tenûrê jê dibariya, di nava zeviyên wê yên ku dengê sirûdên jinan bi ser diketin û li deştên wî yên ku stranên şivanan lê belav dibûn, derbas kir. Li wir, ku ax , strana kevnar hembêz dike û bêhna genim bi bayê spêdê re tevdigere, çand bi bîrê re dike yek û asoyê ji xeyal û zanînê re vedike.

Ew di hembêza xwezayeke rengdêr a ku bêhna dîrokê dikişîne, ku roj di navbera çiyayan de direqisê, û sirabayê di navbera daran de dileyîze û ji xakê bêhna ax û kevirên kevnar belav dibe , mezin bûye. Ev jîngeh ne hema tenê dîmenek bedew bû, lê ew dibistanek rastîn a nirxên neteweyî bû, bi nasname û xweparêziyê dilepite û ruhê reseniya kurdî nîşan dide.

Hewesa wî ya wêjeyî û ramyarî di temenekî piçûk de, di bin bandora mîrata çandî û wêjeyî ya kurdî û jîngeha ku ew hembêz kiriye, dest pê kir, ji zarokatiya xwe ve têgeha wî ji çîrokên dapîran û çîvanokên gelêrî re vebû û ji wan fêrî nirxên qehremanî, berxwedan û serbilindiya bi nasnameyê bû, li gundê xwe yê ku bêhna nan û awazên şivanan jê dibare, hişyariya wî ya yekem despêkir , lewra xak di wijdanê wî de bi bîranînê re tevlihev bû, û evîn û girêdan bû soza wefadariya bi
rehên dîrokê ve.

Vê jîngehê bandor li dildariya wî ya ji bo dîrok û zimanê kurdî kir û bû tovê yekem ji bo rêça wî ya rewşenbîrî û ramyarî ,ji xortaniya xwe ve, ew di bin bandora dewlemendiya dîrokê ya ku veşartî di Dêrikê de maye, di nav wêranên wê yên kevnar de geriya û li çîrokên çiya û çeman guhdarî kir, her kevirekî dîroka gelê xwe jê re digot, her çemekî jî çîrokek ya bav û kalên wî jê re vedibêje, ji ber vê yekê jî jêhatîbûn û azweriya xwe ya ji bo dîrokê ji wan deran girtiye, di wê baweriyê de ye ku bîranîna cihekî, bîranîna mirov diafirîne.

Bi vî awayî , ew di jîngeheke ku xweza, nasname û bawerî li hev dicivîn mezin bûye, di xortaniya xwe de taybetiyên lêkolîner û hizirvanekî pê re geş dibe û ji lavij û sirûdên Kurdî, îlhama hezkirina zanînê, rûmet û girêdayînê werdigire, lêkolînên wêjeyî û dîrokî dike hewes û peyameke ku peyvê bi welat re, û bîranînê bi mandariyê ve girê dide.

Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe û xwendina amadehî û navîn li dibistanên Rimêlanê bi dawî kiriye , paşê bawernama bekeloriya di beşa pîşesazî ya makînîkê de li bajarê Hesekê wergirt û pişt re li Peymangeha Pîşesazî ya beşa Mekanîk li Dêrezorê xwend.

Wî herwiha bawernameya lîseyê di beşê wêjeyî de (bi şêweyê azad) wergirt, û xwendina xwe ya bilind li zanîngeha Şamê berdewam kir, li wir jî hewesa wî ji zanîn û dîrokê re bû sedem ku beşa dîrokê di Kolîjeya Hunerê de bi hilbijêre , ji ber xwesteka wî ku dîroka gelê xwe yê Kurd di lêkolîneke zanistî ya belgekirî de bixwîne.

Piştî derçûna xwe, li çend gunda wek mamoste kar kir,piştre bi fermî li Rimêlanê, û bêtirî bîst û heft salan bê navber karê mamostetiyê berdewam kir, ta ku di sala 2013'an de ji aliyê rêjîma Beis ve ji karê mamostetiyê hat dûrxistin, ji ber çalakiyên wî yên rewşenbîrî û çandî û helwêstên wî yên ronakbîrî yên ku ne li gorî siyaseta tarîkirin
û sextekirina dîrokî
ji aliyê rêjîma Baas ve dihatin bi karanîn.

Di 28/12/ 1986ê de Biradost zewicîye û bavê şeş zarokaye ( çar kur û du keç), Serpêhatî û şehrezayiya xwe da wan, da ku di atmosfereke tijî hezkirin, girêdan û nirxên netewî û çandî de mezin bibin.

Rêwîtiya xwe ya wêjeyî di sala 1980î de bi nivîsandina helbesta klasîk, ya terazû bi rêzbend û kêşe bi zimanê kurdî dest pê kir, paşê bi sedan lêkolîn, gotar û velkolînên dîrokî bi zimanê kurdî û erebî nivîsandin, wî zêdetirî çil pirtûka nivîsiye, di di navbera lêkolîn, destnivîs û semîneran, ku ji wan pênc pirtûk çap bûn ku kurteya serpêhatiya wî ramyarî û lêgerîna wî ya dîrokî nîşan didin.

1-Pirtûkek bi erebî" Bergihek ji zanîna kurdî" .

2- Pirtûkek bi kurdî "Gurzek Gul ji Baxê Zimanê Kurdî" – rêzimana Kurdî.

3- Pirtûkek bi erebî "Dergehek bo dîroka kurdî a kevnar ji serdema kevirî heta hatina îslamê."

4- Pirtûkek bi kurdî "Kurtedîroka gelên Rojhilata navîn û têkilyên wan bi hev re .

5- Pirtûkek bi kurdî, bi navê "Bergihek ji Zanista Kurdî".

Her wiha xwediyê deh destnivîsên neçapkirî yên bi zimanê erebî yên bi navê "Bûyerên ji rewşa Kurd û Kurdistanê" û bîst û heşt destnivîsên bi zimanê kurdî yên bi navê "Bûyerên ji rewşa Kurd û Kurdistanê".

Ew niha pirtûkeke nû bi zimanê erebî amade dike, ku ji sê beşan pêk tê, bi navê "Rêhên hebûna kurdan li Sûriyê ji berbanga dîrokê ve."

Kar û xebatên wî tenê bi nivîsandinê re sînordar nema, di warê lêkolîn, nîqaş û vejandina mîrateya kurdî de xebatên berfireh bi rêvebir, herwiha li bajarên cuda yên herêma Cezîrê gelek semîner dan, di heyama xebatên xwe yên perwerdehî û çandî de bi hezaran xwendekar ji bo fêrbûna zimanê Kurdî di sê astên wê de (1, 2, 3) perwerde kirin, û li wir jî wek şêwirmendê perwerdeyê, piştre serperişt, û wek endamê Saziya Zimanê Kurdî (SZK) û Yekîtiya Rewşenbîran li Kantona Cizîrê xebitî.

Wî rolek sereke lîst di avakirina van sazî û yekîtiyan de mîna:

1- Dîdargeha Rewşenbîrî ya Girkê Legî.

2- Saziya Zimanê Kurdî (SZK) bi destpêka şoreşê re.

3- Saziya Nûrî Dêrsimî li Rimêlan.

4- Yekîtiya Mamosteyan li herêma Girkê Legê û Rimêlan.

5- Yekîtiya Mamostayan a Girkê Legê û hevserokatiya wê û piştre jî hevserokatiya Yekîtiya Mamostayan li Kantona Cizîrê di sala 2014'an de.

6- Yekîtiya Rewşenbîran li Kantona Cizîrê û hevserokatiya şaxê Girkê Legê .

Ew berê endamê desteya rêvebir ya bilind a Yekîtiya Rewşenbîran li herêma Cizîrê û endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê bû.

Her wiha di avakirina gelek sazî û dezgehên perwerdehî û Rewşenbîrî de jî ked daye.

Bi sedan gotar û lêkolînên dîrokî pêşkêş kirine.

Di komîteyên perwerdeyê yên Akademiya Civaka Demokratîk de û di gelek komîteyên çandî û neteweyî de cih girtiye.

Biradost yek ji kesayetiyên netewî yên pabendên doza Kurd tê dîtin, di belavkirina hişmendiya neteweyî û çandî de, bi taybetî li hember zilma rejîma Baasê, roleke girîng lîst, ji ber ku mala wî veguherî qada nepenî ya rewşenbîr û lêkolîneran, û dîdargehek azad ji bo nîqaşkirina çarenûsa kurdan û dîroka wan.

Biradost yek ji navdartirîn kesên ku agirê çanda Kurdî parastiye û di heyama karîyera xwe de pênc xelatên rêzgirtinê wergirtine, ji wan:

1- Ji Partiya Yekîtî .

2- Ji Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.

3- Ji Saziya Zimanê Kurdî (SZK).

4- Ji Yekîtiya Rewşenbîran li Kantona Cizîrê.

5- ji Ajansa Vedeng ya mediyayî.

Ew niha bi erkê rêveberê Ajansa Vedeng a Kurdî radibe.

Ji bilî helbestê, çîrok, lêkolînên civakî û efsaneyên kurdî dinivîse, gotinên pêşiyan û biwêjên gelêrî berhev dike û bi rêya vîdeoyan ji bo belgekirina çîrok û dîroka kurdî dixebite. Her wiha gotarên wî yên siyasî bi zimanên kurdî û erebî jî hene.

Gotarên wî di gelek rojname û kovarên kurdî û erebî de hatine weşandin, ji wan:

Rojname: (Newroz, Ronahî, Pirs, Herekol, Nasname, Vedeng, Riya Nû).

Kovar: (Hiwar, Zengil, Şermola).

Her wiha beşdarî gelek platformên medyayê yên wekî: Book Media, Ronahî TV, Rojava TV, Ariyan TV, Stêrk TV, Ajansa Vedeng, Ajansa ANHA, û di radyoyên Dicle FM, Rojava FM, Radyoya Dengê Jiyanê de cih girtiye.

Biradost Mîtanî ne tenê hema nivîskar, mamoste û lêkolîner e , lê belê ew dengê bîrdanka kurdî ye û lêkolînerê kokên nav axa demê ye, ew dîroknasê ku dîroka netewa kurd hem bi xîmav û hem jî bi nebezê nivîsandiye, di pênûsa wî de zanîn bi evînê re, lêkolîn bi dilsozîyê re , peyv bi nasname re têkel hev bûne.

Wî bi pirtûk, lêkolîn û gotarên xwe pirtûkxaneya çandî û dîrokî ya kurdî dewlemend kiriye û mîraseke dewlemend ji nifşên paşerojê re hiştiye.

Biradost bûye mînaka mamosteyê neteweyî, ku ezmûna akademîk, hestiyariya çandî, nasnameya neteweyî û nirxên manewî li hev dicivîne.

Di kariyera wî de serkeftin û afirîneriyek zêdetir jê re dixwazim.

# Barîna baranê zeviyên kantona Cizîrê geş kir

**Piştî çend salan ji hişkesaliyê, li Kantona Cizîrê îsal baraneke baş bariya û pê re zevî geş bûn, herwiha tevahî çem û rûbarên ku zuha bûbûn jî, ji nû ve herikîn.**



**Esmihan Gedro/Qamişlo**

Li kantona Cizîrê di meha Sibat û Adarê de baraneke baş bariya, ku bandoreke erênî ya eşkere li ser çandiniyê kir. Vê baranê şilbûna axê baştir kir û mezinbûna berheman zêde kir di heman demê de nîşanên baş a serkeftina demsala çandiniyê ya serkeftî da. Lê belê, ev başbûn bi hin pirsgirêkên têkildarî asta bilind a şilbûnê re hat, ku ji bo misogerkirina tenduristiya berheman çavdêriyek ji hêla cotkaran ve hewce dike.

### Bandora baranê di meha biharê de

Barîna baranê di mehên biharê de bi taybetî Adar û Nîsanê ji bo çandiniya li herêma Cizîr mîna “zêrê spî” ye, lê eger ji sînorê xwe derkeve an di wextê nexwestî de bibe, dikare bibe sedema zerarên mezin. Herwiha bandoreke erênî sûdemend li ser geşbûna berheman dike. Di biharê de dexl genim û ceh di qonaxa “guhildanê” sivîlkdan de ye. Baran di vê demê de dibe sedema tijîbûna hûran û zêdebûna berhemê. Ji bo xwedîkirina heywanan, giya û çêregehên herêmê bi barana biharê şîn û dewlemend dibin.



Barana zêde û ba bahoz di meha Nîsan û Gulanê de dibin sedem ku genim û ceh li erdê bikevin. Ev yek dirûnê zehmet dike û hûr di hundirê guhilan de diperçiqin. Ger di dema kulîlkdana fêkiyan wekî sêv, hirmî yan tirî de baraneke zêde bibare, tozkulîlk tên şûştin û fêkî nagirin. Giyayên Bêkêr, barana zêde rê li ber şînbûna giyayên ziyanbexş vedike ku ew jî xwarina axê ji dexl û danan dizînin. Di meha biharê de, herî zêde divê çavê cotkar li rengê pelên genim be. Ger zerbûneke wekî toza zer li ser pelan xuya bibe, nîşana zengara zer e û divê tavilê dermanê fungal bê reşandin.

### Derketina Nexwaşiyan li kantona cizîrê

Li Kantona Cizîrê, ji ber guherîna avhewayê, barana zêde yan jî kêm, û zehmetiyên peydakirina dermanan, gelek nexwaşî û zerar didin ser çandiniyê. Ev yek xeteriya zêdebûna nexweşiya rizîbûna rehenên nebatan çêdike. Herwiha mişkên zeviyan li hin deveran belav dibin, ku ev yek bûye sedema girtina tedbîrên pêşîlgiritinê ji bo sînordarkirina wê û parastina berheman. Li herêma cizîrê û Bakurê Sûriyê, ji bo parastina çandiniyê dermanên cihêreng bi navê fosfîda zincê tên peydakirin û bikaranîn. Ji ber ku guherîna avhewayê tê guhertin û her tim ne di rewşa rêjeyekê de ye dihêle ku hin nexwaşî li ser çandiniyê bê çêkirin.

Ji bo ku berhem bên parastin bi taybetî dexl, dan û sebzeyan ji nexweşî û barana zêde biparêzî divê amadekarî berî çandiniyê bê kirin. Tovên Paqij divê Her tim tovên ku li dijî nexweşiyan bi taybetî zengara zer berxwedêr werin hilbijartin. Dermankirina Tov, Berî ku tov bên çinîn, dive ew bi dermanên fungal (karokî) werin derman kirin da ku kokên riwekan ji rizînê were parastin.

### Parastina ji Barana Zêde û Avê

Xetên Avê di zeviyan de xetên taybet tên çêkirin da ku ava baranê tê de neleyîze û bi hêsanî biçe. Myîna avê di nav zeviyê de dibe sedema rizîna kokan. Paqijkirina Rêyan berî destpêkirina werza baranê, rêyên avê yên xwezayî yên di nav zeviyan de paqij be da ku av neyê girtin. Dema ku baran zêde bibare xetên ku av têre derbas dibe ji xeta xwe ya ku bermehên çandiniyê lê hatine çandin ji xetê derdikeve û xeta avê xerab dibe. Tevî ku baran ji bo axê jiyan e, lê barîna zêde bêwext an jî pir gur dikare sedema zerareke mezin bide gelek cureyên çandiniyê.

### Rewşa çandiniyê ya niha

Rewşa çandiniyê ya niha li herêma (Bakur û Rojhilatê Sûriyê) ji ber barîna baranê ya di demên dawî de bi giştî erênî ye. Piştî çend salên hişkesaliyê, barana îsal ya(2026) feydeyek mezin daye axê û asta ava binerd û ya bendavan zêde kiriye. Bîrên li ser rûyê erdê yên ku 30 metre û 100 metre kûr in, gelekî sûd ji baranê girt. Niha ava wan zêde bûye. Lê belê bîrên kûr ku kûrahiya wan di navbera 150-300 metre ye bi qasî bîrên sererd sûdê wernagirin. Divê baran zêdetir bibare heyanî ku ava bîrên kûr zêde bibe.”Gelek bîr di salên berê de ji ber baran nedihat zûwa bibûn û ava gelek bîran jî hatibû vala kirin. Lê îsal ji ber barîna zêde ya baranê ew bîrên ku hatibûn zûwa kirin wê tijî av bibin. Ji ber ku barîna baranê li ser çandiniyê sûdek mezine ji hin aliyan ve dihêle ku çandî baş bibe û şînatiya wê ber bi rengekî keskahî ve reng bide. Ji ber vê yekê jî îsal li herêma cizîrê rewşa çandiniyê ya niha gelekî baş e.” Barana îsal ya 2026`an ji bo çandiniya li herêma cizîrê mîna veguherînekê bû, ji ber ku piştî çend salên hişke salî û kêmbûna avê hat.

### Rêjeya barîna baranê

Li gorî daneyên herî dawî yên demsala çandiniyê ya 2025-2026’an, rêjeya baranê li herêma Cizîrê piştî destpêka salê geşbûneke berçav nîşan daye. Piştî çend salên hişkesaliyê, baranên meha Çile û Adarê (2026) bandoreke erênî li ser çandiniyê kir.

Zêdebûna ji sedî, Rêjeya barana îsal (2026) li gorî demsala par a 2025`an li hinek deveran 4-5 caran zêdetir bûye. Bandora li bendavan Baranên îsal bûn sedem ku asta ava li bendavên wekî Bendava Başûr Hesekê û Bendava Rojava bi awayekî beriçav zêde bibe.

# Herêma Aliyan bi giha û pincaran geş bûye

**Bi demsala biharê re şêniyên herêma Aliyan a gundewarên Çilaxa û Girke Legê derdikevin çol û zeviyan. Komkirina giya û pincaran çanda jinên Kurd e ku bi hezaran salan e didome.**

Jin li herêma Aliyan a Çilaxa û Girke Legê demsala biharê derdikevin nava zevî û beyaran. Li zevî û çolan rengê xwezayê keske û gelek teşeyên giya yên jin kom dikin, derdikevin. Li van herêman jin demsala biharê li hev kom dibin û derdikevin çolê. Bi hev re çûyîna çolê û giya komkirin, çandeke bi hezar salan e ku jin hebûna wê diparêzin.



Îsal ji salên berê zêdetir baran bariya û şînkayî çêbûye, gelek cure giya derketine û jin ji bo derman, vexwarin û xwarinê kom dikin.

Li herêma Aliyan tolik, stîrzek, xerdel, reşad, parpar, gezgez, ginêber, kartî, tirşok, kîvark, tûzik û hwd hene.

Li herêmê jin gelek cureyên giya kom dikin, ji bo pirsgirêkên tenduristiyê û xwarinê bi kar tînin. Mîna giyayê hîro, babûnc û gulberoj, ji bo xurtkirina laş têne bikaranîn.

Giyayên biharê ne tenê ji bo xwarinê têne komkirin. Aliyên wê yên çandî û civakî li pêş in. Parçeyek ji kevneşopa nasnameya civakî ya gundewarên Aliyan. Bi komkirina giya re girêdana civakê ya bi xwezayê re diyar dibe. Her wiha giya çavkaniya sereke ya xwarin, derman ji bo nexweşan û kevneşopên ji neslekî derbasî yê dîtir dibe.

Li gundê Xerbê Cihûwa yê Çilaxayê welatiya bi navê Hiyam Osman got: “Derketina zêde ya giyayên biharê bi barîna baranê ve girêdayî ye. Mewsimê îsal baş bû û giya gelekî derketiye. Ev giya ne tenê ji bo xwarinê ne. Parçeyekî kevneşopên me yên gelêrî ne. Malbat giya kom dikin, ziwan dikin, dikelînin û ji bo demsala zivistanê radikin.”

Giyayên mîna tolik, stîzerk, babûnc û gulberoj ji bo tedawiya nexweşiyan û kêmkirina êşê têne bikaranîn. **ANHA**



# ‘Pêvajoya Aştiyê ji bêdengkirina çekan ber bi guhertina zagonan ve’


**Nivîskar Ebûd Mexso diyar kir ku qonaxa yekemîn a pêvajoyê ji aliyê tevgerê ve hatiye bicihanîn, lê niha berpirsiyarî li ser dewleta Tirk û hêzên siyasî ye ku soz û guhertinên qanûnî, pratîkî bikin. Herwiha her gav, her çiqas biçûk be jî, dikare bingehek xurt ji bo aştiyê ava bike û got, “Serkeftina vê pêvajoyê ji bo hemû parçeyên Kurdistanê û herêmê girîng û bi bandor e.”**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di Kurdistanê de gelek tevger û şoreşên Kurdistanî hatin lidarxitin, hemû jî di bin yek armancê de bûn ku azadiya gelê Kurd misoger bikin, mafê wan garantî bikin û bindestiya sedsalê li ser Kurdan bê rakirin. Lê mixabin gelek şoreş û serhildanên gelê Kurd bi rêya xiyanet û sozên derew têk çûn. Lê bi avakirina Partiya Karkerên Kurdistan PKK’ê qonaxeke nû di jiyana gelê Kurd de hat destpêkirin, ji ber ev tevger cudayî hemû şoreş û tevgerên din bû. PKK’ê bi hişmendiyeke xurt ji aliyê Rêber Apo ve hat damezrandin, mînaka wê ew e ku heya roja îro jî şerê wê ji gelek aliyan û bi destê gelek dewlet û hêzan di serî de dewleta Tirk dihat kirin, lê nikarîbûn wê têk bibin. Her çiqasî şer rastiyeke tahil be jî, lê tevger bê çare kir ku di çarçoveya parastinê de bersiva xwe bide. Ev şer jî bi encam bû, ji ber ku berê dewleta Tirk piştî şerekî demdirêj da ser maseya diyalogê ku bi awayekî aştiyane pirsgirêka Kurd û Tirk bê çareserkirin. Li ser wê bingehê Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk beriya salekê ango di 27’ê Sibata 2025’an bi bangkirina Rêber Apo ve hat destpêkirin.

### Şert û mercên Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk

Dema Serokê Giştî yê MHP’ê Devlet Bahçelî di civîna 1’ê Cotmeha 2024’an de destê parlamenterên DEM Partiyê girt û di axaftina xwe ya 22’yê Cotmeha 2024’an ya Meclisê de anî ziman ku ji bo mafê hêviyê sûd bigre, bila Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were Koma DEM Partiyê ya li Meclisê, bang li PKK’ê bike, PKK’ê jî dest ji têkoşîna çekdarî berde û xwe fesih bike. Bi ser vê yekê di 23’yê Cotmeha 2024’an de piştî wê Parlamenterê DEM Partiyê Omer Ocalan bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re li Girtîgeha Îmraliyê hevdîtinek pêk anî. Têkildarî gavên Devlet Bahçelî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di wê hevdîtinê de wiha got: “Tecrîd berdewam dike. Heke şert û merc ava bibin, hêza min heye ku ez pêvajoyê ji zemîna şer û pevçûnê veguherînim ser bingeha hiqûq û siyasetê. Ez xwedî wê hêza teorî û pratîk im.”



**Rêber Apo di 27’ê Sibata borî de pêşî li pêvajoya aştiyê vekir**

Rêberê Apo ji bo pêşî li pêvajoyê veke di 27’ê Sibata 2025’an de “Banga Aştî û Civaka Demokratîk” kir û bi bangê re ji PKK’ê xwest kongreya xwe pêk bîne, dest ji têkoşîna çekdarî berde, xwe fesih bike. Peyamên Rêber Apo li tevahî cîhanê bi kelecaneke mezin hatin pêşwazîkirin. Lewra di çarçoveya pêkanîna banga rêbertî de, PKK’ê di navbera 5-7’ê Gulanê li Qadên Parastina Medyayê li 2 herêmên cuda, bi tevlibûna 232 delegeyên ve 12’emîn Kongreya xwe li dar xist û biryara xwefesixkirinê girt. Ev biryar ji bo avakirina derfetên aştiyê neteweyî û navneteweyî wek geşedaneke dîrokî û fersendeke mezin hat nirxandin. Gelek dewlet li pey hev peyamên piştgiriyê dan û xwestin Tirkiyê van derfetan ji bo çareseriyê baş binirxîne. Rêberê Apo piştî 26 salan bi dîmena li ser malpera Ajansa Nûçeya a Firatê (ANF) peyam da û wiha got: “Ez banga xwe ya Aştî û Civaka Demokratîk hêj diparêzim.” Koma Aştî û Civaka Demokratîk a ji 30 kadroyên PKK, KCK û PAJK’ê pêk dihat ku 15 jê mêr; 15 jî jin bûn, di 11’ê Tîrmehê de li pêşiya Şikefta Şanêdanê ya li bajarê Silêmaniyê ya li Başurê Kurdistanê, bi merasîmeke dîrokî, ji bo pêşî li pêvajoyê vekin, bi îradeya xwe ya azad ve çekên xwe şewitandin. Di heman demê de tevgerê biryara xwekişandina ji sînorê Bakurê Kurdistanê cihê ragêşeyê jî da û ev biryar pêk anî, ev hemû gavên tevgerê bûn. Dewleta Tirk jî ji bo ku hinekî rûyê xwe spî nîşan bide, li Meclisa Tirkiyê “Komîsyona Demokrasî Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî” ava kir, lê xebatên komîsyonê pir dereng û bi gavên kêm li gorî pêvajo û gavên tevgerê, dihat meşandin, hîna jî wisa dewam dike. Ev hemû di qonaxa yekemîn a pêvajoyê de pêk hat.

### Pêvajo ji qonaxa yekem ber bi qonaxa duyemîn ve

Di salvgera yekem a pêvajoyê de Rêber Apo bi peyamekê eşkere kir ku qonaxa yekemîn a pêvajoyê bidawî bû û niha em derbasî qonaxa duyemîn dibin. Qonaxa duyemîn jî xebatên wê vê carê li ser dewleta Tirk dimîne ku li gorî soz û gotina xwe, pratîkê nîşan bide, zagonên demokratîk binivîse, destûrê Tirkiyê biguher û ya girîng mafê hêviyê yê Rêber Apo û hemû girtiyên siyasî pêk bîne, ji ber ev qonax bi guhertinên ciddî ve girêdayî ye, hemû guhertin jî bi rengê demokratîk pêwîst e bên pêkanîn.

Derbarê Qonaxa yekemîn û duyemîn a Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, nivîskar Ebûd Mexso ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Bêdengkirina çekan ji bo pêkanîna aştiyê gava pîroz e’

Ebûd Mexso diyar kir ku piştî her şerekî aştî yan jî lihevkirinek heye û wiha got: “Piştî şerekî demdirêj ku ji sala 1984’an dest pê kir û heta Pêvajoya Aştiyê domand, ev şer pir dijwar bû. Di vê şerê de bi 10 hezaran ji yên PKK’ê şehîd bûn û bi hezaran jî birîndar bûn. Herwiha ji aliyê dewleta Tirkiyê jî bi hezaran hatin kuştin û birîndar bûn. Di heman demê de bi milyaran dolar dirav hate xerckirin. Ev şer zêdetirî ji 40 salan dirêj bû. Lê di encamê de, diyar e ku her şerê ku heye, dawiya wî aştî û lihevhatine. Ji bo vê yekê, rêveberiya tevgerê di salên 1990’î de, bi taybetî di 19’ê Adara 1993’an de, şer ji yek alî ve rawestand. Ev destpêşxêrî zêdetir ji 7 caran hate dubarekirin û her car jî ji bo aştiyê şer hate rawestandin, lê dewleta Tirk berê xwe nedida aştiyê. Ji bo vê yekê, cara dawîn Pêvajoya Aştiyê bi bangekê ji aliyê Rêber Apo ve di 27’ê Sibata sala borî de dest pê kir. Ew nameyek ji cîhanê re şand ku şer bi temamî were rawestandin û çek bên şewitandin, da ku dengê çekan li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê nemîne. Di vê çarçoveyê de Kongra 12’an jî hate lidarxistin û PKK jî hate fesihkirin. Ji ber vê yekê, ev gava aştiyê ya Pêvajoya Aştiyê ku dest pê kiribû, gavekî pîroz e û pêwîst e ku li ser vê gavê jî meş bên çêkirin.”

### ‘PKK’ê tevgera ku li gorî demê xwe diguherîne’

Ebûd Mexso eşkere kir ku girîngiya vê pêvajoyê, li gorî guhertinên ku di Rojhilata Navîn de çêdibin, tê xuyakirin û wiha bilêv kir: “Girîngiya vê pêvajoyê, ew e li gorî guhertinên ku di Rojhilata Navîn de çêbûne, ji bo wê jî ev şer hat rawestandin. Di heman demê de yek ji wan tevgerên li pêş, tevgera PKK’ê bû, PKK’ê bi dîroka xwe ya dirêj ku nêzîkî 50’î salan dibe, her dem armanca xwe ew diyar kiriye ku di her demê pêwîst de, xwe biguherîne û guhertinên bingehîn li rêya tevgerê pêk bîne. Ji ber vê yekê, ev qonaxa ku Rojhilata Navîn tê de derbas dibe, girîng e ji bo têgihiştina awayê ku guhertin çawa çêdibin û dewletên desthilatdar çawa dixwazin bi rêbazên xwe aştiyê pêk bînin. Di vê çarçoveyê de, avêtina gavên pêşketîtir ên tevgerê ji bo aştiyê, yek ji wan gavên girîng bû. Bi vî awayî, tê dîtin ku girîngiya vê pêvajoyê pir mezin e, hem li ser Kurdistanê bi giştî bandorê dike, hem jî di asta herêmî de û li ser Rojhilata Navîn jî, bandoreke berbiçav diafirîne.”

### ‘Her gavek bingehekê ji bo aştiyê ava dike’

Mexso tekez kir ku erkên di qonaxa yekemîn a pêvajoyê de dihatin xwestin li ser milê Rêber Apo û tevgerê hatin bicihanîn û wiha pê de çû: “Niha pêvajoya Aştiyê ya ku Rêber Apo dest pê kir û nameya ku şand, qonaxa yekemîn nîşan dide. Di wê nameyê de û di axaftinên ku hatin kirin de, hate diyarkirin ku di nav salekê de her tiştî ji aliyê Rêber Apo û tevgerê pêk hatin. Lê îro pirsgirêka sereke ew e ku gelo dewleta Tirk û hêzên siyasî yên wek AKP û MHP’ê dê ew qanûn û sozên ku dane biguherînin, da ku aştî bi temamî li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê were pêkanîn.? Di vê çarçoveyê de, divê ew sozên ku hatine dayîn bi gavên pratîk werin cih anîn. Wekî ku îro jî tê gotin, “top niha li lîstika wan e.” Li gorî baweriya min, dem hat ku ev gav bên avêtin. Yanî dibê berî Nîsanê jî guherînên qanûnî werin kirin û gav ji aliyê dewleta Tirkiyê ve werin avêtin. Ez bawer im ku ev gav dê werin avêtin, mimkune ew gav biçûk, hindik û destpêk be jî. Lê her gavê ku tê avêtin dikare bingehek baş ji bo aştiyê ava bike. Qonaxa yekemîn bi giştî hatiye bicihanîn, lê niha çav li ser dewleta Tirk e ku gelo ew jî gavên xwe bi cih bîne yan na?”



### ‘Serkeftina pêvajoyê ji bo hemû Kurdistanê ye’

Ebûd Mexso axaftina xwe wiha qedand: “Serkeftina vê pêvajoyê ne tenê ji bo Bakurê Kurdistanê ye, lê herwiha ji bo sê parçeyên din ên Kurdistanê, ango Başûr, Rojhilat û Rojava jî, serkeftinê tîne. Ev pêvajo dikare li ser hemû Kurdistanê bandorek mezin bike. Mînakên ber bi çavan in: şerê ku di navbera QSD’ê û hikumeta demkî ya Sûriyê de beriya sê mehan çêbû. Di vê qonaxê de, mudaxeleya Rêber Apo ya herî bingehîn hat kirin ku bû sedem ew şer were rawestandin û rê ji bo avakirina civakeke demokratîk û aştî were vekirin. Ger ev mudaxele nebûya, dibe ku şer bi awayekî din û bi encamên girantir bidomanda. Ji ber vê yekê, ev pêvajo ne tenê bandoreke Kurdistanî heye, lê di demên pêş de jî dikare bibe bingeh ji bo avakirina civakeke demokratîk li seranserê Rojhilata Navîn.”

# 79 sal ji darvekirina Qazî Mihemed... Rojhilat hemdemî pêvajoyeke nû ye

Qazî Mihemed di rûpelên dîroka Kurdistanê de xwedî cihekî girîng û sereke ye. Komara Mihabadê ku ji aliyê Qazî Mihemed ve hatibû avakirin, mîras û ronahiya di rêwîtiya têkoşîna gelê Kurd de ye. Ew bi tena xwe şoreşek bû, piştî 79 salan îroj gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê derbasî pêvajoyeke xeternak dib, pêwîst e Kurd şîretên Qazî Mihemed ji bo hevrêziyê pêkbînin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Jiyana Pêşewa Qazî Mihemed

Qazî Mûhemed kurê Qazî Elî kurî Qasim kurê Mîrza Ehmed e, yekê Gulana sala 1900'an li bajarê Mehebad, yê Rojhilatê Kurdistanê di malbateke oldar û pêşeng de ji dayîk dibe.
Bi temenekî biçûk, di bin destê bavê xwe (Qazî Elî) û apê xwe(Seyf Qazî) dest bi xwendina ziman û wêjeya Kurdî dike. Piştî ku xwendina xwe bi pileya qazî diqedîne, sala 1924'an dibe rêveberê Desteya Karê Islamê li Mehebadê. 1926'an jî weke rêveberê Desteya Perwerdeyê li Mehebadê dest bi kar dike. Di wê demê de, ji bo pêşxistina asta xwendin û fêrbûnê xebateke mezin dike û du dibistan li Mehebadê ava dike. Ji keçan re jî dibistanekê vedike. Têkiliyên xwe bi xwendekar û rewşinbîran re çêdike. Ji bilî Kurdî, zimanê Erebî, Ingilîzî, Farsî, Rûsî û Fernsî jî dizane. Qazî Mihemed di civakê de xwedî kesayeteke balkêş e, bandoreke mezin û erênî li her kesî dike.

### Xebata Cıvakî û Siyasî

Pêşewa Qazî mihemed di warê siyasî de zana ye û têkiliyên xwe bi gelek siyastmedar û têkoşerê Kurd re li seranserê Kurdistan çêdike. sala 1930'an jî, bi riya Îhsan Başa Norî tevlî partiya xwebûn dibe. Li gel karê siyasî û banga mafê gelê xwe li Tehranê, karê perwerdeyê û xebata civakî dike. Herwiha alîkariya malbatnên xizan, li seranserê Rojhelatê Kurdistanê dike. Piştî mirina bavê wî, 1931'an dibe Qaziyê Mehebadê. Lê ji ber sedemên siyasî û axaftina wî bi zimanê Kurdî sala 1936an ji aliyê şahê Îranê ve, ji kar tê dûrxistin.
1941an Pêşewa tevlî Komela Jiyana Kurdistanê dibe. Li gel şandên komelê jî, serdana Bako dike û li gel berpisên yekîtiya sovyet dicive. Zanebûna wî, bala sovyetan dikşîne. Di sala 1945an dibe serokê wê komelê. Lê ji ber pêwîstiyên reşwa Kurdistanê, Komelê dihildiweşîne. Pişt re Partiya Demokratîk Ya Kurdistanê ava dike û dibe sekreterya partiyê. Bi navê Pêşewa jî tê naskirin. Bi serokatiya wê şanda partiyê, serdana Tebrîz dike û beşdarî maresimê damezrandina Komara Neteweyî ya Ezerbêcan dibe.

### Ragehandina Komara Kurdistan

Ji bo damezirandina partiyê, endam û danerên Komela Jiyanewey Kurdistan berhev dibe. Ne bi dilê hemû endaman be jî bi dengên piraniyê, navê JKê bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê guhartin û beyannameya Partiyê di meha Çiriya Pêşîn a sala 1945an de hate belavkirin. Piştî damezirandina Partiyê û belavkirina bernameya wê, nexşeya siyasî ya Kurdan diyar bibû; amedekariyên ragehandina komarê dest pê kiribûn.
Di 22'ê Berfanbara 1946'an de damezirandina Komara Mehabadê hate îlankirin. Li Meydana Çarçira, piştî axaftina dîrokî ya Qazî Mihemed, alaya Kurdistanê bi xwendina sirûda Ey Reqîb hate bilindkirin û bi coşek mezin ji bo axaftina Qazî numayîş hate kirin. Damezirandina komarê, berhemê pêşkevtina fikra neteweyî ya gelê Kurd û têkoşîna wan an dîrokî bû. Qazî Mihemed wekî Serokkomar û Hecî Baba Şêx jî wekî Serokwezîr hatin hilbijartin. Piştî çend rojan encumena hikûmeta Komarê hate eşkerakirin ew jî ev bû: Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, wezîrê Berevaniyê: Huseyn Xan Seyfî Qazî, wezîrê Karên Hundir: Muhemed Emîn Muinî, wezîrê Aborî: Ehmed Îlahî, wezîrê Ragehandinê: Kerîm Ehmedî, wezîrê Perwerdeyiyê: Menaf Kerîmî, wezîrê Reklam û Danasînê: Sidîq Heyderî, wezîrê Bazirganiyê: Hecî Mistefa Dawûdî, wezîrê Kar: Xelîl Xusrewî, wezîrê Çandinî: Mehmûd Welîzade, wezîrê Avedanî: Îsmaîl Îlxanîzade, wezîrê Tendurustî: Seyîd Muhamed Eyubiyan, wezîrê Şêwirmendî: Ebdurrehman Îlxanîzade û wezîrê Dadwerî: Mele Huseyn Mecdî.

### Ber bi têkçûna Komara Mihabadê ve

Damezirandina Komara Mehabadê, berhemê bîr û îradeya neterweyî ya gelê Kurd bû û di dîroka hevdem a neteweyê Kurd de dewleta yekemîn bû, mixabin temen kurt bû û nizîkê 11 meh li ser piyan ma. Bêguman sedemên navxweyî û derveyî yên têkçûna Komara Mihabadê hene: Di civaka Kurd de li şûna têkiliyên civakî-siyasî, serdestbûna têkiliyên eşîrî; di tevayê bajar û cografyaya Rojhelatê Kurdistanê de nerêxistinbûna PDK'ê û hikûmetê; têkiliyên hinek serokeşîran bi dewleta merkezî ya Îranê re ku hêza artêşa neteweyî ya komarê ji wan pêkhatibû, sedemên herî girîng ê navxweyî ne. Paşvekişyana Yekîtiya Sovyetê û piştgirînedana ji bo Komara Azerbaycan û Kurdistanê, îtîraza Brîtanya û DYA ji bo damezirandina Komara Mihabadê û Komara Demokratîk a Azerbaycanê, bi awayekî aktîf piştgirîdana hikûmeta merkezî ya Îranê, berxwenedana Komara Azerbaycanê jî, sedemên girîng ên derveyî ne. Di 31'ê Adara 1947'an, li qada Çarçira ya ku cihê ragihandina Komara Mihabadê bû, her sî qazî ji bo darvekirinê tên amedekirin. Qazî Mihemed bi vê gotinê bersiva dagîrkeran dide: "Erê hûn niha Qazî Mihemed dikujin, lê bi hezaran Qazî wê werin afirandin, wê têkoşîn û xebat xwe dewam bikin."



### Hewldana yekbûna Kurdan a Qazî Mihemed

Roja ku li Meydana Çarçira damezirandina Komara Mehabadê hate ragehandin, di gel xelkê berhevbûyî, ji parçeyên dî yên Kurdistanê jî serok û kadirên siyasî beşdarî merasimê bibûn. Serokê serhildana Agirî Îhsan Nûrî Paşa bi xwe jî vexwendiyê vê merasimê bû, lê ji ber şertên neyênî nikarîbû beşdar bibe. Qazî Mihemed ji bo wê roja dîrokî û wergirtina wezîfeya serokkomariyê weha dibêje: "Armanca min ev e ku ez yekbûna vî milletî bibînim ku îro çar parçe bûye. Serokkomarbûn tu demekê nehatibû bîra min. Lêbelê miletê Kurd min layiqî vê wezîfeyê dîtin. Ez jî dixebitim da ku layiqî vî milletê bibim." Wesiyeta Qazî Mihemed û sozên Eceman… îroj li Rojhilat divê were bicihkirin.

### Wesiyeta Qazî Mihemed, yekîtiya Kurdan li hemberî siyaseta Eceman

Ev beşek Wesiyetnameya Qazî Mihemed, bi giştî kerekterê hemû dijminên Kurdan û bi taybetî jî yê eceman pir bi zelalî diyar dike û divê ji bo me hemûyan her dem bibe wek guharekê: "Birayên min! dijminê Kurd ji çi reng û qewmekî be her dujmin e; bê rehm e, bê wijdan e, rehmê bi we nake, ewê we bi destên we bi xwe bide kuştin, ewê we temah bike û bi fêlbaziyên xwe û bi derewan we li hev bixe. Di nêv hemû dijminên gelê Kurd de dijminê Ecem ji hemûyan zalimtir û meluntir û xwedênenastir û bêrehimtir e, destê xwe ji tu tawanên hemberî gelê Kurd naparêze, di dirêjiya dîrokê de kerb û kîna wî li dijî gelê Kurd hebûye û heye. Binêrin tevaya mezinên gelê we ji Simaîl Axayê Şikak heya Cewher Axayê birayê wî û Hemze Axayê Mengurr û çendîn mirovên din her hemû xapandine, aram kirine û xelk ji piştevanî kirina wan dûrxistiye û ji nûh ve bi zor nemerdane kuştîne. Ji wan re sûnd bi Quranê xwariye ku Eceman niyaza xêrê bi wan re heye û wê başiyê bi wan re bikin. Lê heçî Kurd e, zû bawarî ji sûnd û sozên Eceman dike û pê tête xapandin, lê bi dirêjiya dîrokê heya nûha tu kesan nedîtiye tu caran Ecem soz û peymanên xwe bi cîh bîne û tu sozên xwe bi Kurdan re bi cîh neanîne, her hemû derew û fêlbazî kirine. Ez, wek birayekê biçûkê we, di rêya xwedayê de û ji bo xatirê xwedê ji we re dibêjim hev bigirin û qet pişta hev bernedin. Pirr bawer bin eger Ecem hingivînî bide we, diyare jehr kiriye di nêv de, bi sûnd û soz û derewên Eceman nehên xapandin, eger hezar caran dest li Qurana pîroz jî bidin û sozê bidin we, jê bawer nekin û pirr bawer bin tenê merama wan xapandina we ye." Mebesta Qazî Mihemed bi Eceman, ew hêzên biyanî weke Birîtaniya, Ferensa, Amerîka îroyîn û hwd… Eger em li têkilya van hêzan bi Kurdan re binirxînin em ê bibînin ku timî siyaseteke şaş li hemberî Kurdan meşandine, bûne şûr di pişta gelê Kurd, îxanet kirine. Li Rojavayê Kurdistanê derencama geşedanên ku çêbûn wiha bû. Ji derveyî têgiha xiyanetê, Amerîka û hêzên navdewletî siyaseteke baş nedan meşandin ku bihêlin gelê Kurd bibe alîgir û hêzeke bingehîn. Di şerê Israîl-Amerîka li ser Îranê xwestin gelê Kurd li Rojhilat bi kar bînin, lê gelê Kurd nekete wê xefkê, berovajî wê yekîtî û enyeke netewî ji partiyên Kurdî hate avakirin, ev yek destkeftiyeke pir mezin bû, berî niha bi dehên salan Qazî Mihemed şîreta xwe kiribû û gotibû bila baweriya we bi Eceman neyê, lê belê hevgirtina xwe ava bikin.

## 'Ez jî dixwazim Serok Apo bibînim!'



E.Pêjder Altan

Nivîsa nivîskarê Yenî Ozgur Polîtîka Fuat Alî Riza ya bi sernavê 'Gerîla û Gel Dixwaze Serokê Xwe Bibînin' pir xweşê min çû. Lewra di qada Newrozê yên hemû heremen Rojavayê Kurdistanê de ji heft salî heya heftê salî heman daxwazî diqêriyan.
Newroz her sal tê, lê hin salan hene ku ne tenê bihar tê, belkî dîsa xweşiya gelê tê. Ev sal, di nav baran û çemê de, di nav çemçemoka serdemê de, deng û dil wekhev bûn. Milyonan, ji Amedê heta Frankfurtê, ji Hewlêr heya Qamişlo wekî çiyayên ku li hev hatine, heman peyamê bilind kirin: dîtin, axaftin, azadî.
Gotinên fermandarê gerîlayan Murat Karayilan di 18ê Adarê de wekî şemek li nav tarîyê ronahî kir. Wekî ku gerîla di salekê astengî de xwe li ber hev dan, wisa jî daxwaz kir:
"Gerîla dixwaze Serok Apo bibîne."
Ev ne tenê daxwaza gerîlayê ye; ev daxwaza serdemê ye. Ji rojnamevanan bigire, rewşenbîr, akademisyen, siyasetmedar, heya em dikarin hineke din jî pêşdetir biçin, Mesud, Nêçîrvan Barzzanî, Bafil Talabanî jî dixwazin Serok Apo bibînin.
Çimkî her prosesê ku dixwaze bi aşitî ve çêbibe, pêdivî ye ku dil û deng li hev bigerin. Lê ev dil û deng, wekî ku Karayilan got, hîn jî bi rêkûpêk li hev nakevin. Wisa ku çiyayên du aliyên rêya aşitî hîn jî li hev nehatine.
Li her meydanê, li her çarçoveyê, sloganek heman bû: Azadiya fizîkî ya Serok Apo.
Ev slogan ne tenê gotin bû; bû dengê dilan. Bû avê ku ji nav çemê derket. Bû agirê ku ji nav çiyayê berfî derket. Her kes ku li meydanan hat bû, dît ku gel ne tenê li ser axaftinê ye; gel li ser xwe ye. Gel dixwaze ku kesê ku di navbera wê û aşitiyê de ye, di nav gelê de be, di nav axaftinê de be.
Ev Newroz tenê peyam ji dewletê re nehat şandin. Peyam ji siyaseta kurdî re bû. Gel got: "Yekbûnê paşde nexin, yekbûn niha ye."
Ev peyam wekî ba ku di nav çiyayên baharê de tê, her derê girt. Ev daxwaz ne nû ye; lê niha bû dengê ku çiyayên jî nekarin bê guhertin.
Encam
Newrozê 2026 bû rojê ku gel xwe dît. Bû rojê ku gel peyama xwe bi dengê bilind da.
Ev deng dibêje: diyalog, dîtin, azadî û yekbûn. Lê sibê dereng e pêwîstî bi niha heye.
Ji ber ku yekbûna Demokratîk ya Kurdan pêdivî ye û nabe derengî bikeve.
Ev daxwaz:
Ji serhildanên Rojava ve dest pê kir, di 8ê Adarê de hate bilindkirin û di Newrozê de bû daxwaza stratejîk.



# Aloziya li Reqayê û êrişên li dijî Kurdan

Reqa ya ku beriya heyva Çileya 2026'an cihê ewlehî û mînaka bajariya pirrengî û nasnameyan bû, piştî hatina hikumeta demkî ya Sûriyê, ev muzeyîk veguherî bajarekî wêrankirî, bê ewle ku kes nizane wê li ku û kengî bê kuştin an revandin. Berbelavbûna bê ser û ber û kîna li hember gelê Kurd, jiyana gel wêran kiriye.

**Zana Roj**

Bajarê Reqayê ji aliyê Hêzên Sûriye Demokratîk, YPG û YPJ'ê ve di 20'ê Cotmeha 2017'an ji destê DAIŞ'a ku weke peytexta xwe îlankiribû, hate rizgarkirin. Di wir de Rêveriya Xweser xwe tê de birêxistin kir û Reqa ji aliyê gelê wê ve dihate birêvebirin. Bi vê yekê re Reqa ya ku bi pirrengiya xwe ya etnîkî û olî tê naskirin, her çû qeş bû û bû mînake demokrasî û azadiyê piştî rizgerkirina wê ji destê DAIŞ'ê. Em ê zêde behsa dema borî nekin lê em dixwazin piştî hatina hikumeta demkî ya Sûriyê û ketina hêzên ewlehiya giştî, rewşa Reqayê ber bi ku ve çû. Reqa weke Dêre Zorê di aliyê civakî, aborî û ewlehiyê de bi lehiya tevlîheviyê re diherike. Bêhesbxwestin sivîl bi jin û zarokên xwe têne girtin û windakirin, bêhesabxwestin û lêpirsîn di nava tarîtiyekê de bi sedan kes hatine qetilkirin. Her wiha berbelavbûna bê ser û ber jiyana gel bi metirsiyên rojene re kiriye yek, wê kengî li kuderê dest bavêjin ser mal û milkên welatiyan, diziyê û talankirinê bikin, ne diyar e.
Piştî derketina Rêveberiya Xweser ji Reqayê û ketina hikumeta demkî gelk bûyerên kuştin, talankirina mal û milkên gel, revandin û windakirin hatin rûdan. Ev hemû ji bilî rewşa jiyanî ya gel û zehmetiyên ku di aliyê Elektirîk, sotemenî, perwerde û hwd.. de tê jiyankirin. Bi vê yekê re qelek bûyer û nêzîkatiyên li hember gelê Kurd hatine kirin, her wiha kiryarên ku bi serê gel hatine kirin, ji aliyê Çavkaniya Mafên Mirovan a Sûriyê ve hatin belgekirin. Ji wan em ê hin ji kiryarên ku bi serê gel û di Reqayê de tên kirin bilêv bikin.

### Ji dema derketina Rêveberiya Xweser û metirsiya li ser gelê Kurd bi kîn û nefretê tê domandin

Bi ketina bajarê Reqayê re piraniya gelê Kurd yên ku li wê derê jiyan dikirin di nav de koçberên Efrînê yên ku zêdetirî salekê bû li wê derê jiyan dikirin, mecbûr man ku careke din koçber bibin û derkevin. Bi nêzîkatiyên kîn û nefretê li hember gelê Kurd yên ku ji salên dur û dirêj ve li wir jiyan dikin, nêz dibin û kiryarên dermirovî pêk tînin. Ji wan nêzîkatiyan hin bûyerên bi vî awayî hatin derketin û hê jî didomin.
Ji demên ketina hikumeta demkî ji Reqayê re gelek bûyerên serdegirtinê bi taybet li hember malbatên Kurd hatin pêk anîn. Hêzên "Ewlekariya Tawanan" ên hikumeta demkî kampanyayek ji serdegirtin û girtinên keyfî li dijî hejmarek sivîlên Kurd li bajarê Reqayê pêk anîn. Ev yek di bin çavdêriya rasterast a rêberên ewlehiyê yên di herêmê de hatin pêk anîn, di nav tirsa zêdebûna binpêkirinên sîstematîk ên li dijî gelê Kurd û kesên koçber bi taybet.
Çalakvanên ji Çavkaniya Mafên Mirovan a Sûriyê re ragihandin ku kampanyayê li ser "Taxa Kurdan", herêma derdora Sawamêi û li pişt rêyên trênê, sekinî ku tê de sê ciwanên Kurd yên ji Girê Sipî ku koçberî Reqayê bibûn hatin girtin.
Her wiha di operasyonên ewlehiyê de tevahiya malbat û xwediyên dikanên guhertina pereyan ên ji Girêspî yên li bajêr dijîn jî hebûn, ev yek bû sedem ku hin ji wan ji tirsa girtinê birevin.
Di 5'ê Adarê de, çar karmendên rêxistina Blumont International li Reqayê roja Çarşemê rastî êrîşeke çekdarî hatin, di encamê de fonên wan piştî wergirtina wan hatin dizîn. Çar karmend, ku bi eslê xwe Kurd in ji "Kobanê" ne ev in: endezyarek, parêzerek, endezyarek çandiniyê û kesekî ji zanistên siyasî derçûye bûn. Ew li kampa Til el-Seman li gundewarê Reqayê dixebitin ku ji hêla rêxistina mirovî ya nehikûmî ya navneteweyî ve tê birêvebirin.
Di rêze serdegirtinan de jî di 12'ê Adarê de, careke din hêzên "Ewlehiya Tawanan" ên hikumeta demkî, di bin çavdêriya rasterast a rêberên ewlehiyê yên herêmê de, di nav tirsa zêdebûna leza binpêkirinên sîstematîk ên li dijî koçberan de, kampanyayek serdegirtin û girtinên keyfî li dijî hejmarek sivîlên Kurd li bajarê Reqayê pêk anîn.
Çavkaniya Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku di nav gefên berdewam ên ji aliyê endamên girêdayî teşkîlatên girêdayî Wezareta Parastinê di hikumeta demkî de, binpêkirinên li dijî welatiyên Kurd li bajarokê Eyn Îsa li gundewarê Reqayê zêde bûne ku ev yek tirsa ji xirabûna rewşa ewlehiyê zêde dike û dibe sedem ku hejmarek malbatan ji ber tirsa li ser can û milkê xwe bajêr biterikînin. Ev êriş li ber çavên endamên ewlehiya giştî yên li herêmê amade bûn, bêyî ti destwerdanek bibandor ji bo rawestandina binpêkirinên pêk hatin, were kirin. Her wiha di van êrişan de hat destnîşankirin ku êrişkaran alên Sûriyê hildigirtin û dema ku milkê welatiyên Kurd dişkandin tekbîr diqîriyan, di heman demê de heqaret, nifir û hewldanên rûreşkirinê dikirin ku bandor li sivîlên temen mezin dikir ku hin ji wan ji 70 salî mezintir bûn.
Di 22'ê Adarê de, çavkaniyên herêmî ji Çavkaniya Mafên Mirovan a Sûriyeyê re gotin ku komeke çekdar ji eşîrên herêmî li bajarokê Eyîn Îsa ya gundewarê Bakurê Reqayê ku piştgirên hikumeta Sûriyeyê ne, hejmarek dikanên welatiyên Kurd ên




li bajêr talan û xira kirine.

### Polîtîkayeke sîstamatîk li dijî gelê Kurd

Bi gelemperî ev rewşa ku li Reqayê tê jiyankirin bi awayekî bi zanebûn tê kirin ku bi taybet dixwazin gelê Kurd yên ku di wir de jiyan dikin tengav bikin û kîna xwe ya li dijî gelê Kurd sar bikin. Girtinên ku tên kirin li ser pişta tohmetên çêkirî pêk tên, û hewldanek ji bo têkbirina lihevkirinên têkildarî vegera ewle ya kesên koçber bo malên xwe tê kirin. Ev kiryarên ku li dijî sivîlan tên kirin, li ser bingeha etnîkî û tewanbarên derewîn tên kirin. Li gorî agahiyan, gef ji aliyê komên çekdar ve tên xwarin ku hin endamên wan bi rêxistinên girêdayî Wezareta Parastinê di hikumeta demkî ya Sûriyeyê de ne. Çavkaniyên herêmî piştrast kirin ku hejmarek malbatên Kurd niyeta wan heye ji ber ku tirsa ji gefên berdewam zêde dibe, ji bajêr derkevin ger parastina pêwîst ji aliyê rayedarên pêwendîdar ve neyê peyda kirin. Gotinên kîn û nefretê li ser dîwarên mal û dikanên gelê Kurd tên nivîsandin ku tu kes nikare li hember wan bisekine û hesab jê bixwaze. Helbert ev hemû di rêze tevlîheviya ewlehî ya ku di Reqa de tê jiyankirin de ne.

### Ne tenê gelê Kurd.. Reqa meydana tevlîhevî, dizî û serdegirtinane

Bûyerên cuda cuda yên diziyên çekdarî pêk tînin.
Di bûyerekê de komek ji çekdaran ku ji 5 kesan pêk dihat an xwe wek leşkeran nîşan dan, kelûpel û pere bi qasî 4 hezar dolarî ji dikanekê dizîn. Her wiha xwediyê dikanê revandin û ew birin cihekî nenas berî ku wî li deverek dûr biavêjin.
Li bajarokê El-Cezra yê li gundewarê Reqayê, xortek ji aliyê çekdarên nenas ve di mala xwe de hate gulebarankirin û bi guleyekê li lingê xwe birîndar bû. Li gorî çavkaniyan ku di destpêkê de zilam bo nexweşxaneya netewî ya Reqayê hate veguhestin û piştre ji ber rewşa wî ya xirab veguhestin nexweşxaneya Tib el Hedîs.
Her wiha Çavkaniya Sûrî berê di 14'ê Adarê de belge kiribû ku welatiyek li nêzîkî garaja zeviyê li Bakurê navenda bajarê Reqayê ji aliyê çend kesan ve rastî lêdaneke tund hatiye, di encamê de ew bi giranî birîndar bûye. Her wiha êrişkar bêyî ku kesek bizanibe sedema êrişê çi ye, reviyan e.
Di van demên dawiyê de di bûyerek din de li Reqayê, vîdyoyek êrişek li ser hejmarek zarokan di nav atolyeyek tamîrkirina motorsîkletan de nîşan da ku ev zarok, tevî temenê xwe yê biçûk, di şert û mercên ku neqanûnî têne hesibandin de dixebitin.
Vîdyo nîşan dide ku sê zarok piştî girêdanê, bi amûrên hesinî û daran li lingên wan tên lêdan, di heman demê de xuya ye ku zarokên din li benda dora xwe ne ku bên cezakirin, di heman demê de yek ji zarokan lava dike ku ji lêdanan xilas bibe.
Ev bûyer ji nû ve balê dikişînin ser rastiya binpêkirinên li dijî zarokan li hin deveran, çi bi rêya îstîsmara laşî be çi jî bi rêya îstîsmara di karên dijwar de di temenê biçûk de, dide diyarkirin.

### Rastiya ku tê jiyankirin bi çend mînak û bûyeran nayê îfadekirin

Me xwest em balê bikşînin ser rewş û rastiya ku bi taybet gelê Kurd di Reqayê û gundewarên wê de pê re rûbirû dimînin bînin ziman. Ev kiryarên ku tên kirin, ji kiryarên ku li ser gelên Elewî û Durzî hatine pêk anîn ne qut in. Ger îro em behsa lihevkirin û entegrasyonê dikin, wê demê hikumeta demkî tev rayedar û berpirsyarên xwe yên li van herêman li hember van piratîk û nêzîkatiyan berpirisyar in. Bûyerên ku me ronî kirine, beşek biçûk ji rastiya ku li wî derê rojane tê jiyan kirine. Heyanî niha bi sedan kes hatine kuştin, jin û zarok hatine revandin, tevî bîlancoyên ku gelek zarok ji ber bermahiyên şer jiyana xwe ji dest dane.

## Newroz û Xwenûkirin



Hafiz Ahmet Turhalli

Newroza sala 2026'an, Newrozekî bi heybet û wêneyekî ji bo cîhanê bû. Newroz bûye Nasnama Kurdên Niştimanperwer. Ji ber ku dagerkerên welatê me bi navê qanûn û yasayan, bi navê ol û biratiyê, cejn, ziman, çand, dîrok û hebûna me li me qedexe kirin. Hemû tiştên bi Kurd û Kurdistanê ve girêdayî, li me heram kirin. Lê Newroza îsal li pêşberî hemû cîhanê ev herambûn û qedexe qelişand û têk bir.
Qaşo em birayê hevdû yên olî bûn; lê ol jî ji bo tunnekirina milletê me bikar anîn û berdewam tînin. Aboriya me lawaz kirin, dîroka me ji holê rakirin, xwenda û zanayên me terkî welat kirin, an jî zindanî kirin. Ji bo me asîmîle û tunne bikin, hemû hêza xwe û bi dek û dolabên xwe berdewam li ser me kar dikin.
Qaşo kesên neha desthelat di destên wan de ne, li Rojava, Başûr, Bakur û Rojhelat, dibêjin em Birêveberên Oldar in!
Pêxember Muhemed sXl ji bo biratiya Olî weha dibêje: "Kesê tişta ji nefsa xwe re dixwaze, ger ji bo birayê xwe jî heman daxwazê neke, ew bawerî bi ola Îslamê ya rast neaniye."
Zimanê wan fermî ye, lê zimanê Kurdî qedexe ye, çanda Kurdan dizîne û navê xwe lê danîne, dibêjin ev çanda me ye. Dîroka Kurdan bin av dikin, tiştê tê de behsa Kurdî hatiye kirin vedişêrin. Folklor û xwarinên Kurdî, bi darê zorê kirine mîrateya xwe.
Dagirkerên miletê me, nefret û kîna xwe berdewam li me dibarînin.
Hemû kar û xebatên wan yên li ser tunne kirina me, hêjî berdewamin. Li beramber vê kîn û nefretê,
divê gelê me jî, bi hemû alî û çînên xwe, bi Bawerî û hişmendiyên xwe, xwe nuhde ava bike û azadiya xwe misoger bike.
Newroz; xwe nuh kirina xwezayê û şîyarbuna ji xewêye.
Dar kulîlk û xweza bi şiklekî nuh jîyana xwe ava dike, rengên cuda ku huzurê û kêfxweşiyê didine nîşandan, li hemê erdnîgariyêne, dikevin pêşbirkê, daru berê kû weke mirî di xewdabu, bi ihtîşamekî mezin jiyana xwe carekî din raber dike.
Weke xwezayê me jî bi cil û bergên rengereng, cejna Newrozê pîroz kir û bi milyonan kesên ji xew rabibûn gotin em li virin û têk neçûne.
Divê piştî Newroza îsal, hemû Kurdên dilsozê azadiyê, weke kulîlkan bi reng û cudahiyên xwe xwe nû bikin.
Ji hişmendîyê bigre, heta zimanê xwe nuhde ava bike.
Lewre neyarên me hemu rengên me xira kirin, bîr û baweriyên me tevlîhev kirin, dîrokekî ji derew, çandekî ku tu têkiliya wê bi çanda me nîne ava kirin.
Çanda malbat buna me û yê civak buna me ji holê rakirin û çandekî ku bi xwezaya mere nakoke bi darê zorê li me pêçandin.
Bi vê Newrozêre divê em vegerin ser koka xwe, bi çanda xwe xwe nuhde ava bikin.
Zimanê xwe yê şêrîn bi hemû devokên wê ve ji nû ve zindî bikin.
Di malbatên xwe de li çanda xwe vegerin, bi cil û bergên xwe bi çand û rengên xwe, liser koka xwe şitil bidin.
Sîyaseta me, aboriya me, zanabunên me, oldariya me, hunermendî û wêjeya me, weke kulîlkên biharê nuhde vebibin û karibin kêfxweşîyê dinava cîhana Kurdî û ya giştî de şênber bikin. Xwe li ser bingeha rawişt û xwezayê ava bikin.